

Cerdevaniyê têrî nekir ew kirin kontra...



Rûpel 3

✓ Ji weşankar Ayşe Nur Zarakolu der barê rewşa jinên kurd de da xuyaniyên balkêş: Binihêrin jinên kurd çawa şerê azadiyê zivirandin serhildanê, guherîn ev e. Do ew jin xîli nava şer de bûn, wê îro jî bi serhildanên aştîyê azad bibin.

Rûpel 8-9

✓ Qederek li ser kevîr bêlîvîn li Ronî nihêrt. Ji berîka xwe piştîkek bi rengên Ala Rengîn xemilandî, derxist û li serê wî yê bi xwîn, lefand. Berê xwe ber bi çiyê ve kir, laşê Ronî rakir, tilîliyêk dirêj kişand û wilo ma.

Rûpel 12

✓ Rojnameger Ramazan Öztürk dide xuyan ku Celal Talebanî jê re gotiye hêzên kurd di sala 1982'an de bi Saddam re ji bo lihevhatinê rûniştine, lê ji ber ku Tirkiyeyê gotiye wê alî Îranê bike, peyman nehatiye îmzekirin.

Rûpel 16

NAVEROK



Avesta Zerdûst "Gatakan" ji pênuşa Ehmed Şerîfî

4



Bajarê Ûrartûyan ê pîroz: Ardin, ji pênuşa Î. Culemergî

6



Çiroka hişyarbûna kurdan "Rojbaş," ji Teatra Jiyana Nû

7

Ji Xwendevanan

DI medreseyên welêt de, ji panzdeh salî ya xwe ve, min pirtûkên bi zimanê xwe xwendine. Mewlûda Meleyê Batê, Nûbihara Ehmedê Xanî û pirtûkên li ser gramera zimanê erebî. Pê re ji xwendina dibistanên pişaftkaran.

Bi rojnameyên Azadî û Welat, min dest bi xwendina kurdî ya bi alfabe ya latînî kir. Ew roj ev roj e, ez bûme tir-yakiyê vê xwendinê.

Lê mixabin ku vî mafî jî, xwe li me negirtiye. Ez ti û birçiyê vî mafî me. Ditirsim çavên min vekirî bimirim û tîr nebim.

Bi gotina diya min "Destê Xocê Xizir li piştê me be". Ez jî dibêjim destê gelê kurd li piştê me be.

GIYAN BEKIRXAN
AMED

EM şad in ku em xwedî rojnameyê kurdî ne, em şad in ku em xwedî televîzyonê ne. Lê em xemgîn in ku li welatê me şerekî qirêj heye.

Kuştin heye, koçberî heye, girtin heye. Li dijî vê zilm û zordariyê yekîtiyê pêwist e. Îro ji bo yekîtiya hêzên her çar parçeyê Kurdistanê xebat tê kirin. Lê mixabin hinekên ku xwe serok dizanin dibêjin, ne wext e. Gelo îro wext nîn be, wext kengê ye?

Û. SEYDA



Kurmên me

MEHMET GEMSİZ

D emên berê, kurmên me ne rêxistî (organîzekirî) bûn. Teketûk û ji hev belawelayî bûn. Zêde ziyar nedigihandin gewdeya me. Sultan Abdulhemît ê Osmanî, pêşî li vê rewşê girt û ew anîn cem hev, bi navê Alahiyên Hemîdî. Di sala 1891'ê de ji aliyê Mufetîşê Artêşa Çaremîn M. Zekî Paşa ve hate avakirin.

Sultan Abdulhemît di bîranînên xwe de li ser vê yekê wiha dibêje: "Li Rûmeliyê, nemaze li Anadolê ji bo xurtkirina tirkên, berî her tiştî şert e ku em kurdan di nav xwe de vestrînin û ji xwe re biki-ne mal." Li ser vê kirina sultan, navê "Bavê Kurdan" jî lê tê danîn. Çi bav!

Dengbêjen me di lawik û stranên xwe de ji bo wan milîsên kurmancan jî dibê-jin. Di nav gel de ji wan re "cendime-yên bejik" jî tê gotin.

Abdulhemît bi avakirina "Alahiyên Hemîdî" jî namîne, îcar di sala 1892'yan de "Dibistanên Eşîran" dide vekirin. Di wan de zarokên mîr û serokêlên kurdan û gelên netirk dide hêvotin. Bi mebesta ku wan bi xwe ve girê bide û ji bo ar-mancên xwe jî, ji wan îstîfade bike.

Tiştêkî balkêş e, hin ji wan kesên ku di wan dibistanan de gihiyane, pişt re li hemberî osmanî serî hildane. Pêwist e ku li ser van kurdan jî vekolîn û lêgerîneke baş bê kirin.

Ev yek bi tenê ji aliyê rêveberiya os-manî nayê pêkanîn. Kurdên başûrê welêt jî, gava li hemberî Iraqê ji bo azadî û serxwebûna xwe tédikoşin, li dijî xwe kurmên xwe dibînin. Serwerên Iraqê jî, ji kurdan hêzên rêxistî çêdikin û bi ser kur-dên azadîxwaz de dişînin. Kurdên Başûr, navê "çehş" li wan dikin. Bi vî aw^{ayî}

peyveke din jî dikeve ferhenga kurdî ya li ser xizîziya navxweyî. Çehş û deşş, her du yek tişt e û ji têjîkê kerê re tê go-tin. Sedemê ku ew nav li wan hatiye da-nîn jî ev e. Deşş an jî çehşê kerê, li dû dê û bavê xwe naçe, ji refên xwe hez nake. Her bi heywanên ne ji celebê xwe re dileyîze û digere.

Dewleta tirk, piştî pêngava 15'ê Gela wêjê (tebaxê) ya PKK'ê, di sala 1987'an de dest diavêje dekolabên kalikên xwe yê Osmanî. Ji kurdan bi navê "pa-rêzvanên gundan" hêzên çekdar dide sazîkirin û wan li hemberî gelê wan dide bikaranîn. Bi vê rewşê re çend peyvên din jî li ferhenga kurdî zêde dibin; wekî çete, cerdevan, xwefiroş, gundparêz....

Ev kurm, ji dijmin û neyarên kurdan bêhtir ziyar gihandin tevgera rizgarîxwaz a kurd û gelê kurd. Tiştên ku nekirine nîn e. Ji cerd û talanê heta bi destavêtina namûsê, ji esrar û eroynê heta bi mirov-kujî û revandinê...

Nûçeya me ya bi navê "Cerdevaniyê tîrî nekir, ew kirin kontra" rewş û wesfên wan êşkere dike, bê ew çî ne û çî bi vî gelî dikin.

Peywira rewşenbîriyê

N ivîskar Mazhar Kara di Roj-nameya Ronahî, hejmar 37'an, rûpel 18'an de, bi na-vê "Heta ku derê" gotarek weşandibû. Vê nivîsê gelek xwendevanên welatparêz dilşikestî û xemgîn kirin. Di wê nivîsê de, ji bo parastina mirovekî, birêz Kara gelek nixwên neteweyî yên pîroz û giranbûha dane bin piyan.

Wî berevaniya Şivan Perwer hildaye ser milê xwe, ew parastiyê, lê ne lazim bû ku ev çend ji rê derkeve. Parastina mirovên xebatkar peywira me ye, lê ne bi pelçiqandina nix û saziyên neteweyî. Sed xwezî, berî ku wî ew nivîs biweşanda, gotara Felat Dilgeş a bi navê "Nêrîn" di rûpela dehan de, bixwen-da an jî li wêneyên rûpelên dawiyê bi-nêriya, wan xortên ser jêkirî dilê wî bi-sota, belkî wî dev ji wê nivîsarê berda.

Divê bê zanîn ku ez ne endamê Par-tiya Karker im, lê rastiyeke heye, ger li hesabê hin kesan neyê jî divê ew rastî ji layê rewşenbîran ve tim û tim bête di-kirandin. Ev peywîreke neteweyî ye. Îcar gotinên min jî ev in:

Divê ku hunermendên me rastiyeke bi-bînin û bi pênuş, firçe û awaza xwe beşdarî şerê rizgariya neteweyî bibin û hûn bizanebin ku "rewşenbîr" ji kesên ku bi zanibûna xwe, gelê xwe rewşen û ronahî dikin re, tê gotin.

Divê hûn bizanibin ku şerê azadiyê ne ji bitirî ye, pêwistî û daxwaza gelê bindest û stembar e, di encamê de ar-manc aştî û biratiya gelan e.

Divê hûn bizanibin û tê bigihîjin ku ewên malên wan hatine şewitandin, hilweşandin, gundên wan hatine kavi-

Divê bê zanîn û têgihîştin ku ewên malên wan hatine şewitandin, hilweşandin, gundên wan hatine kaviilkirin; kinc, qût, nivîn, rez, bexçe, sewal û rêl û daristanên wan hatin sotin, şer nedixwestin; aştixwaz bûn, lê baş dizanibûn ku netewe û niştîman bi leqeleg û gotinên vala rizgar nabe.

Î. OMERÎ

kirin; kinc, qût, nivîn, rez, bexçe, sewal û rêl û daristanên wan hatine sotin, şer nedixwestin; aştixwaz bûn, lê baş diza-nibûn ku netewe û niştîman bi leqeleg û gotinên vala rizgar nabe.

Divê hûn tê bigihîjin ku şervan jî aş-tixwaz in û hûn barê netewe û niştîma-na xwe hildin ser milên xwe.

Divê hûn bizanibin ku mirî nikarin zindiyan rizgar bikin û divê hûn bizani-bin ku şervanên azadiyê, berjewendên gelê xwe di ser giyana xwe re digirin û di ber gelê xwe de pakrewan dibin

Divê hûn bizanibin ku ew pakrewan nemirine dijîn û bi xwîna xwe nexşeya welatê xwe xêz dikin; neteweyekê di-vejînin.

Divê ku gelê we bi we bawer bibe û hûn jî karibin xwîna xwe di ber gelê xwe de birijînin, da ku gelê kurd bika-ribe xwe bispêre we. Divê hûn riya rast

şanî gelê xwe bidin û wan ronak bikin û heta hûn bizanibin û binivîsin ku ge-lê dil û bindest, bêtêkoşin û xwînrijan-dinê rizgar û fereste nabin.

Divê hûn qîmeta avahî û saziyên ne-teweyî bizanibin û bipejirînin û hûn tê bigihîjin ku dema MED-TV, Meclîsa Neteweyî û Kongreya Neteweyî hatiye û derbas jî bûye.

Divê hûn tê bigihîjin ku saziyekê neteweyî ji bona mirovekî nayê terxan kirin û ku ew saziyên hatine avakirin, hêviya gel û welat in. Divê Şivan Per-wer, mamosteyê xwe yê seretayî Eh-med Kurdî bi bîra xwe bîne û di MED-TV'yê de çend stranan ji gelê xwe yê stembar re belaş pêşkêş bike, û hûn tê bigihîjin ku referandûma berfan-bara 1995'an, ya li bakurê Kurdistanê bi saya MED-TV pêk hatiye.

Divê hûn bizanibin ku MED-TV xeml, sebir, bûk û amojgeha her malê kurd e, û em dev ji we bernadin...

Birayê hêja, vê nivîsa we bûyereka anî bîra min ku li gorî rewşa we ye. Di-wextekê de, Musa Anter, Faik Bucak, Kemal Badîllî û hevalên xwe, biryar digirin ku şeveke rohilat li Stenbolê çêkin. Ji bo şevê govendeke bêsaaz û awaz amade dikirin. Mamosteyê wan jî Kekê Kemal Badîllî bû.

Dema di provayê de direqîsîn, Kekê Kemal dibêje: "Hîn girantir." Yê de govendê de reqsa xwe giran dikin, lê mamoste dibêje: "Hîn girantir, hîn girantir, hîn girantir..." Hema gorbihuş Faik Bucak radiweste. Mamoste Kemal hêrs dibe û dibêje: "Ji bo çî sedemê tu sekîni?" Gorbihuş dibêje: "Hîn giran-tir ev e, rawestan e, bêfvî ye."



MESUT Yılmaz û Tansu Çiller piştî hîlbijartîne ji bo ku hikûmetê ava bikin çend caran li hev rûniştin, lê li hev nehatin û tiştek nema ku ji hev re negotin. Wan li serserokwezîriyê li hev nedikir. Piştî ku danûstandînen ANAP û RP'ê ber bi başiyê ve çûn, ji leşkeran ferman hat. Li ser fermana artêşê, herduyan jî gotînen xwe yê berê ji bir kirin û li hev hatin, hikûmet ava kirin.

Ji protokola hikûmetê ku di rojnameyan de hat nivîsandin, tê fêmkirin ku ev hukûmet li dijî aşîyê, li dijî mafê gel û ji bo talanê hatiye avakirin. Di protokola koalîsyonê de cihê herî zehf arizîkirina şîrketên dewletê angî KIT'an digire.



LEŞKERÊN tirk, li dijî agirbesta PKK'ê dişa dest bi operasyonan kirin. Dewleta tirk ji bo ku operasyonên xwe gurtir bide meşandin, artêşeke din ava kirin. Hetanî niha li Tirkiyeyê sê artêş hebûn, ev artêşa ku li Kurdistanê tê avakirin, dibe artêşa tirkîna a çaremîn... Dewleta tirk dixwaze vê biharê agirbestê têk bibe û şer gur bike. Jixwe, ji ber vê yekê ferman dan ku ANAP û DYP li hev werin û hikûmetê ava bikin. Wekî ku tê zanîn; PKK'ê di sala 1993'yan de jî agirbest îlan kiribû, lê dewleta tirk bersiva vê agirbestê bi operasyon û valakirina gundan dabû. Tê tirsîn ku encama vê agirbestê jî wekî wê be.

NÛÇE

Cerdevanîyê têrî nekir, ew kirin kontra

Cerdevanan heta niha gelek tiştên xerab kirine; ji kuştî-nê heta bigihêje ticareta esrar û eroînê... Li Diyarbekirê, li gundên navçeya Pasûrê (Qulpê) ji nav cerdevanan tîmeke taybet hate amadekirin. Ev tîm ji aliyê Komutanê Alaya Pasûrê Bînbaşi Ali Erdönmez ve hat berhevkerin û di vê tîmê de 20 cerdevan cih digirin. Karên wan jî, bi taybetî kuştin û mirov-revandin e. Ev mirov di nav gel de jî, bi navê "çeteya qatîlên kirêkirî" tên naskirin. Berî niha bi sê mehan, îtîrafkar Abdullah Adıgüzel ji wan re kirin serek.

Ji ber ku gund vala kiribûn û gundiyan gund berdan, li navçeyê bi cih bûn, "çeteya qatîlên kirêkirî" jî, berê xwe dane navçeyê. Bi taybetî, ew li lokalên jandarma, emniyet û mamosteyan bi cih kirin. Koma ku li Pasûrê di lokalên jandarma, emniyet û mamosteyan de bi cih kiribûn, bi direktîfa Bînbaşi Ali Erdönmez û di bin bîrpirsiya Abdullah Adıgüzel de, bi hisiyatên dînî li dijî PKK'ê dest bi propagadayê kirin.

Çete çawa ava bû?

Komutanê Alaya Pasûrê Bînbaşi Ali Erdönmez, tevî leşker û cerdevanan ji bo vê tevgerê gund bi gund geriya û propagandaya vê tevgerê dikir. Ji sercerdevanan, du kesên ku karibin vî karî pêk bînin dixwest. Leşker li Şêxhemza, Reşikan, Kanikan, Haşikan, Tiyaks, Şêxbuban, Koyislam, Nederan, Şawîşan, Haskar, Cixsê û Ture digerin, lê tenê karin ji pênc gundan mirov bidine hev. 20 cerdevanê ku ji pênc gundan dabûne hev, tevî komê kirin.

Navên van cerdevanan: Ji gundê Tiyaksê, Eshat Ayyıldız, Ömer Altun, ji gundê Kanikan, sercerdevan Mizbah Akdeniz, Maruf Yılmaz, Vezir Akdeniz, Enver Akdeniz, Şükrü Akdeniz, Örfî Akdeniz, Salih Akdeniz û kurê wî, ji gundê Şawîşan, sercerdevan H. Beşir Bozkurt, ji gundê Nederan, sercerdevan İlhamî, ji gundê Hevêdanan, Nurfî, Beşir, Ali û ji gundê Koyislam jî, Recep...

Çawa dixebitin?

Tu kes nizane ku çiqas meaş distînin, çî karî bi çî awayî dikin. Di serî de cerdevanan bi tirs li vê tevgerê dimihêrtin. Ji ber vê yekê jî, cerdevan bi tevahî tevî tiştekî wisa nebûn. Abdullah Adıgüzel, ê ku berî bi du salan teslîm bûbû



û pişt re jî bûbû îtîrafkar, berî niha bi sê mehan ew kirin serekê ve çeteyê. Hê di serê xebata vê tevgerê de M.K. ku bi xwe berê cerdevan bû, li dijî vê tevgerê derketiye, bi qasî ku jê hatiye, agahî dayê xelkê. M.K. dibêje: "Abdullah Adıgüzel hem herêmê hem jî xelkê ve derê ji nêzîk ve nas dike, ji ber vê yekê ew kirin serekê çeteyê", û li gotina xwe zêde dike: "Berî ev çete ava bibe, Adıgüzel li qereqolên li ser rê kar dikir û di kontrolkirina nasnameyan de cih digirt. Bêhtir li qereqola jandarmayan ya Seykerê ku li ser riya Pasûr û Liceyê bû, wî bi xwe nasname kontrol dikirin. Piştî ku Adıgüzel reviya û teslîmî dewletê bû, gelek derb li PKK'ê xistibû. Û gelek caran jî, tevî operasyonê leşkerî dibû."

M.K. dibêje ku piştî bîrpirsiya çeteyê dane Adıgüzel, avêtina ser gundan û li navçeyê jî avêtina ser malan zêde bûne û di vê demê de jî windabûna miro-

van dest pê kiriye. M.K. dide xuyakirin ku ev çete bi dizî (illegal) dixebite, lê bi dewletê re di nav danûstandina fermî de ye û bi vê mînakê jî ve yekê eşkere dike: "Berî niha bi demekê, yekî bi navê Ümit Ay li ser Pira Ağaçlı xistine bin çavan û piştî mehekê, di 25'ê rezberê (îlon) de ew derxistine DGM'ya Diyarbekirê û ew berdan."

Adıgüzel û çeteya xwe bi bêtêl, çekê giran û demançe diavêjine ser gundan, mirovan direvînin û îşkence bi mirovan dikin.

Bi kincên polîsan zilam revandin

Dema çete nû dest bi kar kir, li Pasûrê û gundên derdora wê bi kincên polîsan mirovekî dixine binçav, jê tu agahî nayê standin. Osman Buluttekin berî niha bi 4 mehan ji Girtîgeha Diyarbekirê hatibû berdan, roja 24'ê gelawêjê cerdevanên (çeteyên) ku kincê polîsan li xwe kiribûn, telefonê jî qut dikin

û Osman Buluttekin digirin binçavan. Piştî vê bûyerê diya Osmana Buluttekin, Kariban Buluttekin serî li gelek cihan dixê, lê tu encamê bi dest naxe. Li ser vê yekê, dotira rojê diçe ber devê emniyeta navçeyê, benzî bi xwe de dike û dibêje ku wê xwe bişewitîne. Lê polîsên nobedar nahêlin. Diya Osman Buluttekin diyar dike ku piştî vê bûyerê li navçeyê serî li komutaniya jandarmayan û li Diyarbekirê jî, serî li DGM'ê xistiye, lê tu encamê bi dest naxe.

Kariban Buluttekin wiha didomîne: "Piştî ku kurê min ji girtîgehê hate berdan, ji aliyê hinek kesan ve bi riya telefonê di hate tehdît kirin. Roja 24'ê gelawêjê, bi şev 4 mirovên bi bêtêl (tel-siz) û çek, ku digotin em polîs in, avêtin ser mala me. Wan kesan, qederê saetekê mala me serobino kirin û pişt re jî, kurê min î ku bavê 5 zarokan bû tevî kincên şevê bi xwe re birin." Kariban Buluttekin dibêje, ew wan kesan nas nake, lê ji bêtêlên di destê wan de, bawer dike ku ew polîs bûne.

Bi kincên gerîlayan livbazî

Cerdevanên kontra, li navçeyê û gundên derdorê bi kincên gerîlayan jî livbaziyan dikin. Bi kincên polîsan li navçeyê diavêtin ser malên mirovên welatparêz û bi kincên gerîla jî, diçin gundên ku ne cerdevan in. M.K. ku berê cerdevan bû, mînaka ve yeka dawî jî wiha dide: "Berî bi demekê, bi kincên gerîla avêtin ser gundê Abdullah Adıgüzel, Yeşilköyê. Li gundê Yeşilköyê 60 mal hene. Diavêjine ser mala yekî bi navê Talhat ku bi welatparêzî tê naskirin. Derî ji wan re venakin, di wê navê de jî muxtarê gund Celal Yaşar tê hawara wan û wan ji gund derdixin."

Cihê propagandayê mizgeft in

Piştî çêkirina vê rêxistina kontrayî, mizgeftên ku di dema şer de hatine xerakirin, tamîr dikin û di ber re jî yê nû vedikin. Berê li navçeyê mizgeftê hebû, niha hejmara wan bûye pênc. M.K. eşkere dike ku mebesta cerdevanan xapandina xelkê ye. Xwe bi rengê oldar didine naskirin û li dijî PKK'ê propagandayê dikin.

KEMAL ÇAYAN

Avesta Zerdûşt "Gatakan"

Zerdûşt pêxemberî mezinî gelanî îranî le sedeyî şeş û mîber le zayin le welatî Mad (Kurdistanî nihu) le dewr û berî ziray (gol) î Wirmê hatote dunya. Pirtûkî pîrozî Zerdûşt Avesta ye. Ke be manay serdemî nuwe ye û zor le zarakewanî kurdî êstaman deçê.

Girîngtirîn beşî Avesta gatakan e be manayî bangawaz û hawar e. Ke renga em beşey le serdem û dewranî Huwexşeter padşay be navûdengî Mad da gotibê. Yesinay 51'î Gatakan be navî Huwexşeter gat meşhûr e. Ke lêre da deykem kurdî. Heta kurdey baş le bîr û bawerî berzî Zerdûştî kurdî bigeni.

Huwexşeter Gat ser cem 22 hore û stran e.

Stranî yekemîn

Ey Ehora Mazda

Welatî xoşewistî giranbeha, wek pişkê dilovanî rastî dedirê be kesê ke be xîretewe baştirîn kirdewe encam bidat.

Nihu ez dixwazim ku pişkêkî wam pê bibexişirê.

Stranî duyemîn

Pêş hemû dilniyayek ey Ehora Mazda, le welatî cawîdanî (hemîşeyî) xwet î pir rastî û Armitî (Firştey dilovanî) ît bede be kesanê ke be hoy niyet pakewe sitayîş deken. Sûd û qazanciyan pê bibexişe.

Stranî sêyemîn

Ey Ehora, ey zatî pak, guwê le kesanê ragire ke le kerdar û gotariyan da, guwê dedene qîsê û muçyarîtan û pal we kidewey baş deden. Kesanê ke eto hewelîn muçerîyanî (Melim, amuzgar mamosta) ey Mazda.

Stranî çaremîn

Le kuwê ye padaşî zehimetkêşan, le kuwe ye efû (bexişan) le bo gunahkaran. Le kuwê be rast degene Armitî (Firştey dilovanî) pîroz debînin, lew cêgaye ke welatî cawîdanî to ye ey Mazda.

Stranî pêncemîn

Paş emane le to depirsim. Aya werzêrî (gundî cotkar) dirustkar û hoşmend le rastî xwey da degate nîmetî cawîdanî, eger ew her ew kesey ke dawerî dirust û huşyarî basî lêwe dikird. Le padaş û sezay agadarî kird het sitayîş bikat.

Stranî şeşemîn

Mazda paş tewawbûnî jîyan. Le rojî pesilan (qiyamet). Le welatî cawîdanî xwetda ewê ke başe, dede bew kesey ke bote hoy xoşnudi wî her wesa bed kerdaran be sezay nafermanî degeyenê.

Stranî heftemîn

Ey kesêkî ke le bîrî pîrozî xwet yeksim (-hesp.....) û av û giya û cawîdanî û hana (berzî-yarî jît afiranduwe, be destyarî we homen (firîştey çakî û başî) le rojî dawerî peslan da, hêz û tewa-



ndîm bê bibexişe.

Stranî heştemîn

Nihu lew dû şite demewê bidem ey Mazda, belê zand jî debê xeberdar bê û bizanê le naxoşî kesêkî ke be hoy diroperestiyew giriftarî bela debê û le xoşî kesêkî ke be rast rû le peyamberî xwe deka.

Stranî nehemîn

Çi padaşê bo layengiranî her dû dest, le Agirî sûr û asinî gudaxite (Asinî qalkiraw) çêdekey, bo xawendilanî rastî nîşaneyek danê, yanî, zerer û ziyay bo diropêrestan û sût û qezanc bo peyrewenî rasiteqîne.

Stranî dehemîn

Kê cige lew bo nabudî min hestawete ser bê ey Ehora, ew kesey ke le diro le dayik buwe, her bem hoyewe ew dijî bûnower (mevcudat) î baş raperîwe, ez ji bo yarmet rastîni xwe, be hemû giyanewe daway bixişîş dekem.

Stranî Yazdemîn

Kêye ew piyawey ke dostî rasteqîney espintiman Zerdûşt e ey Mazda. Kêye ke be rastî dexwazê rawej bikat, serincî firîştey Armitî celib ka. Kêye ew dirustkarey ke be rastî dilsozî layengiraniyetî.

Stranî donzdemîn

Ew Zerdûşt espintimanî ke le sermazistana da mabû yarmetî neda û Zerdûşt ke be espewe le serman delerzî penana neda.

Stranî sêzdemîn

Bem cure, ew diropereste, padaşî rastî, ke bo kes gelî raste welana. Rûh û rewanî wî le ser perdî (çihwat) le katî

dawerî da pir le xof û heras debê. Çünke be hoy kirdewe û gotarî, le rêge rastî lada.

Stranî çardemîn

Kerpanekan (dujminanî Zerdûşt) nayawewê le beramberî yasay werzêranda ser danewênin, be hoy Azarêkî ke ewan be yeksimanî degeyenin, her xwet dawerî bike û le rojî pesilan da be hoy kerdar û govtarî na rewayan deçine yaney diro ya ne.

Stranî panzdemîn

Padaşêkî ke Zerdûşt bo yaranî le pêş çaw girtuwe her eweye ke ewel le yane (Mal-xanû) çakî da, padaşî çak e le Mazda Ehora werdegirin. Geyîştin be ewe ey Eysa (Firştey dilovanî) û ey Wehomen (Firîştey çakî) çawî hîvam le êwe ye.

Stranî şazdemîn

Keyguştasip, be şayetiye, le gel yaranî dîni emey pesend kird û rêgey rastî Ehoray pîrozî helbijard. Ew cêgey hîwa ye, kar û bar be akamî eme ye.

Stranî hîvdemîn

Feraşistere Hogo (babî jîni Zerdûşt) kiçî xoşewist û delalî da be min. Şahenşay tewana Mazda Ehora, ewî be hoy eymanî pakiyewe dewlemen ke

Stranî hijdemîn

Camasib hogoy dewlemendî mezinîş bawerî rastîni hêna. Kesêkî ke bem welate cawîdaniye pena bênê ke xawenî Nîhadî baş e, le tom dewê ey Ehora Mazda bibe penay raste qîney.

Stranî nozdemîn

Mîdyîomâyeh (Kurî arastî, amoza, pesmamî Zerdûşt) le Malbatî sipinti-

man, paş ewî xwî nas kird û zanî ew kesey ke bo cîhanîtir dekoşê, hesta ser pê het xelkîdîş agadar bikat, ke peyrewî le dîn û ayînî Mazda le dirêjayî jîyan da baştirîn şit e.

Stranî bîstemîn

Ey kesanê ke be rastî hatune ser rêgey rast ey Wehomene, ey Armitî, katê ke bê dirêx pesend kiran, rehmet û bizzey xwetan be eme bibexişin her wek biryar dira penay xwetan le eme dirîx meken.

Stranî bîstûyekemîn

Le pertewî parsay (yezdanperestî) be miqam û payey pîroz degen ew kesaney ke pendar (bîr) û gotar û kerdarî baş û eymaniyan le ser rastî bê. Mazda Ehora be yarmetî Wehomen be kes gelî wa welatî cawîdanî debexişê, ez jî hîvayekî wa başim heye.

Stranî bîstûduyemîn

Ez deynasim ewî ke sitayîşî le rûy rastî bo min baştirîn şit e, ew ke Mazda Ehora ye, we firîştekanî ke hemîşe bûn û debin, ez dexwazim ke naviyan bêjim û be stranewe niyayşîyan bikem û lêyan nîzik bimewe.

Yesinanî Huwexşetere Gat lêre da kotayî dê. Yezdan yar bê carêkî dî Gatêkî dikey Avestay Zerdûşt dekeyne kurdî û paş tewawbûnî Gatakan ewcar wişekanî Avesta û kurdî pêkewe miqayese dekeyn. Heta xwêneranî welat agadariyekî baştiryan le ser Avesta hebê.

EHMED ŞERÎFÎ

Şarezahiya Misra Kevnare

Arkeolog Howard Carter di sala 1922'yan de ji şarezahiya Misra Kevnare gelek şopên girîng kifş kirin. Lê belê di wê xebatê de hinek xeletî jî çêbûn. Xeletiya herî mezin a wan, di dema kolandina li hemberî bajarê Luksorê de tê dîtin. Carter rabûbû axa ku ji kolandina gora Qral Tutankaman derketibû, avêtibû cihekî din, ê ku hîn nehatibû kolandin. Xeletiya ku H. Carter kiribû, heya 67 salan bala tu kesî nekişand. Lê belê sala 1989'an arkeolog (Bastannas) Kent Weeks lêgerîneke din kir û dît ku Carter xeletiyê mezin kiriyê. Xeletî, di cihê ku axa derketî lê hatiye rijandin de, çêbûye. Weeks bi zûka ew xweliya ji wir derxistî da paqijkirin.

sala 1989'an arkeolog (Bastannas) Kent Weeks cihekî nû dît. Piştî kolandinê, deriyekî nû derket û dît ku, li ser diwêr navê lawê Qiral Ramses hatiye nivîsandin

Piştî wê paqijkirinê, deriyekî nû derket û dît ku, li ser diwêr navê lawê Qral Ramses hatiye nivîsandin. Weeks, berê xebata xwe hemû da ser wir. Heya şeş salan xebateke berdevam, kir.

Di nava wan salan de, du odeyên din hatin dîtin. Di wan odeyan de bi hezaran hacet, zêr û zîber derxistin ber çavan. Ji xeynî van tiştan Weeks, li ser tiştêkî zêlal bû ku, ew ji wê bi şûn de, goristana malbata Qral Ramses bû. Weeks û hevalên xwe gelek kêfxweş bûn. Bi wê psi-

kolojiyê xebat zêdetir kîp (pihêt) girtin, ji ber ku li ser malbata Ramses heta niha zêde tişt nedihate zanîn. Piştî re, di destpêka sala 1989'an de cihê sêyemîn kifş kirin. Ew du ode bi deriyên ve girêdayî korîdorê (navbir) bûn. Esreqa wê navbirê bi 16 stûnan li ser piyan dima. Stûriya wan stûnan, yê her hebekê yek

metre çarkoşe bû. Û valabûna wê derê bi tevayî sîrprîzeke mezin bû. Ji ber ku kapaxa wê derê, di ser de jî hebû ku, bi rast hatineke baş zinarek ev deriyê jor girtiyê û nehiştiye ax û tiştên din bikeve vir. Weeks dît ku ew cih bi temamî cihê malbata Qral Ramses e. Ji 52 lawên Ramses 50 heb li wir hatine çalkirin (definkirin). Li derdora vî cihê 20 derî vedibûn, dirêjîya vir 50

metre bû. Ji xeynî van odeyan, du heb jî korîdor bi vir ve girêdayî bûn. Yek li aliyê çepê, yek jî li aliyê rastê cih girtibûn, dirêjîya van 24 metre bûn û li ser van, ji her yekî 16 derî dihatin dîtin.

Niha dîtina Weeks ew e ku bi xebata wan ji bo kesên ku li ser dîroka Misrê dixebitin gelek malzemeyên girîng hatine bîdestxistin û derketine ronahiyê. Tiştên wan dîtine, 3000 salî di binê gorê de mane.


EZNAS MAYA



Ramses li hemberî mirinê 90 salî li ber xwe da, lê mummyaya wî 3000 salî.

Ji serî heta dawiyê çîroka kişandina fîlmekî (3)

AHMET SONER



Kişandin: Lîstikvan ji bo ku karibin kesên di sernaryoyê de bilîzin, divê pêşî lêgerînan bikin. Wekî awayê axaftina wan, gotinên ku bi kar tînin, rabûn û rûniştina wan, meşa wan, livên dest û tiliyên wan û hwd. Lîstikvanê ku baş li sernaryoyê xebitiye, eger guherîna di sernaryoyê de çêbibin jî, dikare rola xwe bilîze. Her lîstikvan dixwaze zêde li ser perdeyê bê dîtin. Ji ber wê yekê, lîstikvanên profesyonel rolan didizin. Dizîna rol, bi axaftina giran, carinan bi sekn û fikirîna, bi kirina tevgerên ku bal bikişîne, pêk tê. Di rewşên wiha de divê rejîsor têkilî bi wan bike.

Divê rejîsor jî, her roj bi awayekî xebitî were kişîna fîlm. Divê planan li ser sernaryoyê çêkiribe û zanibe ku wê kamerayê li ku bi cih bike. Piştî ku li provayê temaşe kiribe, divê karibe rolan bi sînor bike û divê bêserî bernede. Li gorî bernameya ku beriya kişîna hatiye amadekirin, hemû sehneyên der û hundir, qeydî fîlm tînin kirin. Fîlmên negatîf ên ku hatine kişandin (ew di navbera 40 û 100 qutiya de ye û di her

qutiya de 120 metre fîlm heye), ji bo ku bêne banyokirin, li laboratuare tê şandin. Senaryo, ji bo cara dawîn, di ber çav re tê derbaskirin. Lê tê nihêrtin, ka sehneyeke ku nehatiye kişandin heye an na.

Laboratuar: Fîlmên negatîf tene banyokirin. Ji wê kopyaya negatîf, ku dirêjahiya wî ku di navbera 5 û 10 hezar metreyî de diguhere, fîlmên pozîtîf tene çapkirin. Ji wê re kopyaya kar tê gotin. Kopyaya kar pêşî tê temaşekirin, piştî re li ser maseya montajê tê birîn. Her sehne li gorî rêza wê ya di sernaryoyê de, tê rêzkirin. Fîlmên ku wê hîç neyêne bikaranîn û yê dubarekirî tene veqetandin. Ji van parçeyan re "şût" tê gotin.

Pevbestîn: Fîlmên ku hatine birêzkirin, bi hev ve tînin bestandin (girêdan). Ji wê yekê re pevbestîna bi ser re tê gotin. Piştî ev yek qediya, dest bi pevbestîna bingehîn tê kirin. Valahî û dirêjahiya ne hewce, tene birîn. Dirêjahiya fîlm kê-m-zêde tînin 2500 metreyî. Nişandana fîlmekî 2500 metreyî, 90 deqîqe ye.

Zarvekirin: Kopyaya kar ku pevbestîna wê hatiye çêkirin, ji bo muzîk û dublajê, ji nû ve tê birîn. Li ser sehneyên ku wê kîjan bi muzîk û bêdeng be, biryar tînin standin. Axaftina lîstikvanan ên di fîlm de, li gorî livên devên wan, tene zarvekirin. Ev dengên ku bi banda manyetîk hatine qeydkirin, piştî re li ser maseya montajê bi dîme-

nan re tê temaşekirin. Ji vî karî re senkron tê gotin. Efektên wekî dengên piyan, derî û telefonê, pe çûn û lihevixistinê jî tînin qeydkirin. Ev jî di şûnên xwe de tînin bicihkirin. Fîlm ji serî heta binî, ji nû ve tê temaşekirin. Sehneyên ku tevgerê hêdî bike an jî bide sekinandin, di fîlm de hebe, jê tînin derxistin. Ji wê yekê re jî revîzyon tê gotin. Dengên fîlmên ku qeydî banda manyetîk bûne, li banda optîk tînin guhaztin.

Pevbestîna negatîf: Li kenarê kopyaya kar hejmarên ku jê re "nimroya feet" tê gotin, hene. Li gorî wan, hejmara negatîf tene rêzkirin. Negatîf jî, li gorî dirêjahiya kopyayê kar tînin birêzkirin û li dû hev tînin bestandin. Di dawiya vî karî de masterê negatîf tê bîdestxistin. Hemû kopyayên fîlm ji wê masterê tînin zêdekirin.

Çap: Li gorî xwestina kopyayan, ew çend jî fîlmên negatîf tene kirin. Dirêjahiya fîlmê pozîtîf 600 metre ye, (yanê 22 deqîqe). Piştî çapkirinê, pozîtîfên ku hatine banyokirin bi hev ve tînin bestandin. Ji makîneya çapê re "matîpo" tê gotin. Negatîfên fîlm û dengê optîk li ser wê makîneyê, bi kopyaya pozîtîf ve tînin danîn. Deng, li kêleka kareyên fîlmên pozîtîf ên dîmen tînin qeydkirin.

Nişandan: Fîlmê pozîtîf êdî ji nişandane re amade ye. Kopyaya ku di makîneya projeksiyonê de hatiye bicihkirin, li perdeyê tê veguhaztin û ronî jî tînin vemirandin.

Bajarê Ûrartûyan ê pîroz: **Ardin**

IHSAN CULEMERGÎ

Xakên başûra Gola Wanê, 2000 sal beriya zayîne (B.Z.) li ser du kevîrên sîmerî ya bi navê welatê Kar-da-ka dihate zanîn. 200 sal piştî faşîlbûna dewleta Ûrartû Ksenophon di zivîrîna dehhezaran (Anabasis) de ji bo gelê deverê yê cengawer dê bigota Kardûkî. Li vir xuya dibe ku, ev herêma mêjûyî warê Kardûkiyan e.


Di salên avabûnê de, li dijî dijminê mezin Asûriyan, li kêleka çiyayên bilind û asê, birc û kelatên wekî Mûşaşîrê (Geverê-Yüksekova), Nêhriyê (Navşar-Şemdînlî) û Rewandîzê hatin pêşvebirin û xurtkirin. Ev bajêr, bi riya navdar ya "leşkerî" ve bi serbajêr Tûşîbayê (Tûj û Ba) ve hatine girêdan.

Beriya yekîtîya Ûrartû û Naîriyan ev herêm gelek caran bûn armanca êrişên Asûriyan. qral ên Asûriyan (ên ku B.Z. di salên 1274-1208'an de hatibû ser kar Selmansarê I. û kurê wî Tûkûltî Nî-nûrta, di kitêbeyên xwe de digotin: "Me 8 welat zept kirin, 51 bajêrên wan wêran bûn, 40 qral şikestin û dîl ketin, xwîna wan mîna lehiyê herikî, bi bac û diravî ve hatin girêdan." Di vir de jî di hête dîtin ku, qral ên Asûriyan ji serokên eşîr û begên kurdan ên cuda û serbixwe dijîn re, qral dibêjin. Nexwe, di wê herêma berteng de hebûna 40 qral î, ne ber aqil e.

Li hember neyarê xwînrêj pêwîst bû ku, wê belavbûn û bêtifaqiyê ji holê rakin. Ji bo wê yekê jî xwecihîyê ên dora Gola Wanê Ûrartû û nêzik û hevalbendên wan ên başûr Naîriyan, bi hev re yekîtiyek çêkirin. Dewleta Ûrartû li ser bingehê wê yekîtiyê hate sazîkirin.

Dewleta Ûrartû tixûbên xwe yê başûr ji ber dagirkerî û talankerîya Asûriyan, di nav serên çiyayên serhildayî de, bi birc û kelatan ve sedek kişandibûn. Bêguman di nav wî dîwarî de birca herî mezin û girîng Bajarê Pîroz bû. Ûrartûyan ji vî bajarî re Arin û Asûriyan jî, jê re Mûşaşîr digotin. Hem li ser rêka leşkerî, hem jî navenda rêveberî û çanda navçeya (eyaleta) rojhilatê bû. Ji ber xakê deverê ya pîroz, Perestgeha "Xwedayê Mezin Xaldî" yê bi nav û deng jî, li wî bajêrî hatibû avakirin.

Ev perestgeh, di dema çêbûna dewletê de hatibû sazîkirin. Piştî şerên gelek dijwar û xwînrêj, bajêr carinan kete bin destê Asûriyan. Di dawîya IX. sedsalên B.Z. 'ê de qral ê Ûrartûyan Îspîûnî û kurê wî Mennûa ji bo vegêrana Mûşaşîrê zehf xebat kirin û bajarê xwe yê pîroz bi paş ve standin. Li ser wê serkeftinê, bi zimanê Akad û Ûrartûyî gedûka Kêleşîne, kêlên serfirazbûnê (abîdeyên zafêrê) dane çikilandin.



Talankirina Perestgeha Ûrartûyan a li Mûşaşîrê, ji aliyê Sargonê duyemîn (B.Z. 721-705)

Lê qral ê Asûriyan Sargonê II. beriya zayîne di sala 714'an de derkete sefera xwe ya 8'an. Mûşaşîr bi êrişekê dagirt û xiste bin desthilatiya xwe. Bajar wêran kir û Perestgeha Xaldî da talankirin.

Banê perestgehê yê mîna dergûşê, xaniyên kêleka wê yê bi gelek tebeqe, serê rimê, ya ku nûnêriya Xaldî li bilindahiyê a banî hatî çikilandin, peykera çêleka ku golikê xwe dimêjîne û çend dîmen ji wan gihîştine roja me ne. Qral Sargon di dema dagirkeriyê de listeya talanê jî bi nivîskar û wênevanên xwe da çêkirin. Di nav wan xenîmet û malê giranbûha de, 9 mertalên zêrîn, xence-reke zêrîn a mezin, 96 rimên zivîn, 393 îskan, 4 heykelên bronz, heykel û erebeya Ûrisan, 130 dest cilên berkirinê yê rengeng, 9 dest kincên ku bi zêr hatine nexşandin, parçeyên ji malê talanê ne. Pîrozbahî û girîngiya bajarê Mûşaşîrê di kitêbeyên talankirina Perestgeha Xaldî ya dewlemend de, li ber çavan e.

Ev bajarê Ûrartûyan ê pîroz, li rojavayê Deşta Geverê, li ser devê Ava Aloşê ye û ximê bajêr û kelatekî mezin heye. Tê zanîn ku ev cih bingeha bajarê Ûrartûyan ê navdar Mûşaşîr e. Li de-

verê kolîn nehatine kirin. Bajarê pîroz ê ku di nivîsînên Ûrartû û Asûriyan de navê wî zêde derbas dibe, ew e. Di Yurt Ansiklopedisi, beşa Hekariyê de naskirin bajarê Mûşaşîrê bi van gotinan tê nasandin: "Çiy ayên Cîlo û Satê li başûra Deşta Geverê digihîn hev û govendê digirin.

Deşt bi kêmasî 2000 metre ji tenga (sewiye) zeryayê bilindtir e. Bilindahiya çiyayên dorhêla wê jî, nêzikî 4000 metroyan e. Di nav wê bilindahiyê de kevîyên dirêj, geravên (golên) cemedê, çal û tenaseyên qulipî û geliyên bêhna dîrokê jê diçe, mişen e (pir in). Ji bo insanê îro jî, herêmeke balkêş û bala, warê kêf û seyrane ye. Bi kurtî bihûstek heye, di nav lûtkeya wan çiyayên serhildayî de. Ji aliyê Satê, Geliyê Geverokê dirêj dibe. Binê gelî 2600 metro ji tenga derya bilindtir e."

6000 sal berî zayîne li dora hezar wêneyî li ser zinar û berojên gelî hatine kulandin. Îro jî di rewşa xwe de gelek tişt berze nekirine. Her wekî mûzeyekê ye di nav zinar û latên Çiyayên Satê de, rex û zozanan, mêrg û çîmenan.

Ev wêneyên li ser rûyê kevîran, di dewra Neolîtîk (berê nû) de hatine çêkirin. Li rex piraniya bizinên kovî yê

ku li deverê dijiyan, motifên geometrik, kelk û davikên nêçîrê, mirovên bi çavan êriş dikin heywanan, hatine taswîrkirin. Hem piraniya wan, hem jî cara yekemîn dîtina figûrên insanan, bû yereke balkêş e. Her wisa gerîde û arkeologan, 8000 sal berî roja ku em têde ne, wêneyên mirovan Zozangeha Mûşaşîrê dîtin. Geliyê Geverokê 15-20 km'yî li rojhilata şûnwarê bajêr e û di mêjûyê de, havîngeha eşîrên kurd ên herêma ye.

Dewleta Ûrartû ya ku 5000 salan li paş çêkirina wan wêneyan derkete hola dîrokê. Lê ew motif û şanogehên heywan û neçîrvaniyê, di nav nexş û nîşanên wan de jî cihê xwe girtin. Peykerêkî beraniyê ku li Geverê hatiye dîtin, motifên tenîştê (kêlekê) mîna yê Geliyê Geverokê ne. Îro jî figûrekî kurdên êzîdî yê olî (dînî), wekî mirovê di nav xelekê de ye. Gelek nexşên li ser berikan (kîlîm) ji ber rengê (şiklê) wan, ji motifên li ser kevîran hatine bijartin û raçandin.

Başûrê rojava, nizarên Cîlo ya li hemberî deştê, rawestayîne silavê. Avên ber kevîyan û kaniyên cemidî, digihîn hev û di Geliyê Aloşê de dipazînin, tene xwar. Cihê ku ava zelal û axa deştê ya ku bi xêr û ber hev û din himbêz dikin, navê wê derav e, Derava Aloşê. Bajarê pîroz Mûşaşîr ê nav û deng, xem û xeyala xwe li wê deravê nivîsiye. Di gotin û serpêhatiyên kurdan de, navê wî, Bajêrî Kengê, Deşta Pûş û Peşengê ye. Jixwe niha jî bi navê Miçîçê gund heye li deşta Geverê û beşeke deştê jî bi navê Deşta Miçîçê tete naskirin.

Di dawîya salên 1970'yî de, li Anadolê jî, li bajarok û gundên dîrokî hatin kolandin û paşeroja wan hate naskirin. Lê mixabin ne kesek nêzikî Mûşaşîr î kevîran bû û ne jî xwestin ku kesek jî bête nêzikahiya wî. Her roj piçeke din dihate paçavtin û binaxkirina di nav sînga deştê de. Bajêrê Ardîne (Mûşaşîrê) va ye ku 2709-2710 sal e di xeweke kûr û bêdeng de ye.

Dibe ku kedxwer tirsîyabin ku ev bajarê dêwane dê ronahî bide dîrok û medeniyeta kurdan, yekîti û nêzikahî û mirovatiya Kardûxî, Naîrî, Ûrartûyan derkeve holê. Ji ber wê çendê nexwestin navenda navçeya rojhilatê, navenda çandê û bajarên pîroz hişyar bikin ji wê xewa giran.

ÇAVKANÎ:

- 1) Yurt Ansiklopedisi, beşa Culemergê
- 2) Anadolu Uygurluğu, Ekrem Akurgal
- 3) İslam Ansiklopedisi, beşa kurdan
- 4) Doğu Anadolu Urartu, Afif Erzen
- 5) Kürt Tarihi ve Medeniyeti, Cemşid Bender
- 6) Zivîrîna Deh hezaran, Ksenophon



Li Çiyayê Cîlo wêneyên ku ji mirovên serdema şikeftan maye.



● 16 Adar 1988

Iraqê Helepçe bi bombeya kîmyevî bombe kir. Di vê bombekirinê de 5 hezar kurd mirin, bi hezaran jî birîndar û seqet man. Ev qetlîam wekî yê berê li ber çavên dinyayê çêbû, tu deng jî cihana nûjen derneket.

● 11 Adar 1972

Li başûrê Kurdistanê peyman a otanomiye hate îmzekirin. Li gorî wê peymanê di hin waran de selahiyet kete destê kurdan.

● 12 Adar 1971

Artêşê cara duduyan dest danî ser rêveberiyê. Artêşê bi muxtirayekê desthilatî ji hikûmetê stand û tevî rêveberiya awarte, hikûmeteke awarte

da avakirin. Di dema vê cûntayê de gelek rewşenbîrên pêşverû hatin girtin û rêberên tevgera xwendekarên hatin kuştin û darvekirin.

● 13 Adar 1982

Sê şoreşger bi destê cûntayê hatin darvekirin. Ibrahim Etem Coşkun, Necatî Vardar, Seyid Kanîk endamê Partiya Ked a Komunista Tirkiyeyê (TKEP) bûn. Ji wan Ibrahim Etem Coşkun kurd bû.


● 12 Adar 1995

Li Taxa Gaziyê ya Stenbolê, li dijî êrişê hêzên tarî, gel raperînek pêk anî. Vê bûyerê li seranserê Tirkiyê û Kurdistanê deng veda. Hêzên dewletê êrişê bir ser girseya gel, di van bûyeran de bi giştî 17 kes hatin kuştin.

AWIR

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİĞİT



Rewşa lêkolînê

Di nav rewşenbîr û xwendeyên kurd de bi taybetî van salên dawîn peyvek ku em li vir û li dera hanê, di vê konferansê û di konferansa din de pir dibihîzin heye. Ev peyv, peyva lêkolînê ye. Ev zêdeyî du sed salî ye ku bi şeweyeke sistematîk meraqdarên ewrûpayî li ser kurdan û Kurdistanê lêkolînan çêdikin û xebatên kurdolojîyê li dar dixin. Ji sedsala 12'yan û bi vir ve ewrûpayî li Rojhilata Navîn digerin. Rastiyek heye; em xwe, bi alîkarî û saya nivîskarên ne kurd, gerok û lêkolînerên biyan nas dikin. Heta berî bi çend salan em kî ne, em çî bûn, me jî xebatên wan derdixist.

Ev heqîqet e û bi kêmanî jî zemanê Marko Polo, heta zemanê Ksenefonê yewnanî û ber bi îro ve, wiha ye. Ev rastî hinekî cihê û bi ferq jî be, ji bo netewe û xelkên din jî ku cîranên me ne, wiha ye. Ev biyanî û qelemên ne kurd, bi piranî ewrûpî ne; îtalî, îngilîz, rûs, alman û fransî ne. Heke em çend nimûneyan bidin; Çîroka Elîşeyla ango çîroka Hezar û şevkê, di sala 1706'an de li Ewrûpayê tê wergerandin. Fransiyekî bi navê Bertelmi De Herbemot, ku di nav salên 1620 û 1695'an de dijî, bi navê Kitêbxaneya Rojhilat lêkolîneke çend cildî dinivîsîne. Di salên 1700'î de alimê zimên W. Jones li ser zimanê sanskiritî lêkolîneke hêjayî pesnê û xurt, çêdike.

Nimûneyeke din ku rasterast me eleqedar dike, wergerandina Avestayê ye. Vî karî jî mirovekî fransî dike. Navê wî ciwamêrî jî, Anqueti du Peron e. Dîraset û lêkolînên li ser Quranê jî di van salan de, dikevin rê. Belê seferberiya mezin piştî sefera Napolyon a li ser Misrê di sala 1798'an de dikeve kar û heta bi roja me bêsekin û sal jî salên din berçavtir didomîne.

Jixwe tiştên ku ewrûpî bi gotineke bi îsabetir rojavahiyên kirine, serdest û desthilatdarên dinyayê îro hinekî, ne hinekî çend hinekî jî meraq û hewesa lêkolînê û vê ger, peyketina markopolojî û darwînî ye. Heger em careke din vegerin ser lêkolînên biyan û ewrûpîyan, li Kurdistanê pir bi kurtî em karin vê bibêjin: Lêkolîn û nivîsandinên ewil jî notên ger û geştê çêbûne. Ewrûpî jî wan re 'Book of Travels' dibêjin. Ev not jî giş ên mîsyoneran, eskerên xwedîrutbe, diplomat û erdnîgarnasan in. Di nav sedsalên 13 û 19'an de, van kesan gelek lêkolînên giranbuha afirandin ku heta bi roja me jî kurdolog jî wan îstifade dikin.

Helbet mebest li vir ne ew e ku em dût û dirêj li ser lêkolînên ewrûpîyan rawestî û yeko yeko şop û dewsen wan bigerînin. Me bi çend nimûne xwest balê bikişînin ser aliyekî mirovayetiya rojavayî.

Kesê ku dixwaze dîroka meraq û lêgerînên ewrûpîyan li ser kurdan û Kurdistanê bi firehî, bi nav û nişan û ciwan binase, bila li kitêba Prof. Dr. Îsmet Şerîf Wanlî binêre, bi navê "Bi çavên seyahên Kevin ê ewrûpî, kurd û Kurdistan" e. Li welatê me tişt, beş, dabaş û temayên beyar ku lêkolînan dixwazin, li bendeyî cotkariyên baş in; destnedayî ne û destên bi rûmet dixwazin. Kar ketiye ser hev, do û îro du ta bûne û bûne gir û çiya. Bêguman rewşa lêkolîn û lêgerînê, îro li Kurdistanê jî berê hinekî cihêtir e, pir kêr, qels û lawaz jî be, vêl û ne kûr jî be, lebat û livek heye. Tevgera rizgarîxwazî û têhna şoreşê digihê vir jî. Ev cephe û enî jî, çerx û aşê vê deverê jî hêdî hêdî dikeve kar. Bi qirçeqirç û zîqezîq, bi dijwarî û serêş jî be, digere. Gavên ewil tî avêtin, kevirên ewil tî danîn, rêza keviran dibe yek, didu û sisê. Rê vebûye, şoreşê îmkân çêkirine, dengê me baştir digihe hev, em jî zanebûn û agahdariyên hev, zûtir û saxlemtir dikarin serwest bibin û ev jî dibe faktor û handereke esasî ji bo dîraset û lêkolînan.



Çîroka hişyarbûna kurdan

Şanogeriya bi zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê gelekî nû ye. Lê dema mirov li hinek berheman temaşe dike, dibîne ku di vî warî de jî gelek gavên mezin hatine avêtin.

Lîstika Teatra Jiyana Nû ya bi navê Rojbaş, mînakeke baş e ji vî re. Ev şanoya ku li gorî agahiyên şanogerên komê, piştî xebateke heft mehan hatiye amadekirin, çîroka hişyarbûna gelê kurd li ber çavên temaşevanan radixe.

Lîstik jî sê perdeyan pêk tê, di perdeya yekemîn de rewşa gelê kurd û şikestîbûna wî tê nîşandan. Însan di nava nezaniyêke bêhempa de ne. Lê pişt re bi teqîna berika yekemîn, karkerek jî hevalên xwe qut dibe û ji xewa kûr hişyar dibe. Ev pêvajoyê heta ku hemû mirov hişyar dibin dewam dike.

Bi serxwevehatina gelê kurd bi hostatî hatiye honandin. Nexweşiya mirovên şikestî, xewn û xeyalên wan bi şeweyeke baş, lê bi awayê ku temaşevanan pê bide kenandin tê pêşkêşkirin. Li aliyê din jî faîli meçhûlan bigire, ta bi koçberiyê gelek mijar di nava şanoyê de çî digire.

Her çiqas hin caran lîstikvan

derbasî nav sinorên ajîstasyonê bin jî, lîstikvan di karê xwe de gelekî serkeftî ne.

Li gorî gotina endamên komê, wan li ser vî lîstikê û şanoya kurdî di nav gel de anket çêkirine û bîr û bawerîya wan a li ser şanoyê xwestine, pişt re jî li ser dikê bi awayekî kolektîf, çar lîstik derxistine holê û ew lîstik bi destê Mamosta Cemîl ve wekî şano hatine nivîsandin, ji navê jî ew hatiye niqandin.

Ew lîstik cara yekemîn bi destûra walîtiyê, di 28'ê gulana 1995'an de û bi giştî 8 caran hatiye pêşkêşkirin. Paşê du caran di TV'ya MED'ê de hatiye nîşandan. Piştî nîşandana yekemîn bi hinceta wê lîstikê, der barê NÇM'ê de doz hatiye vekirin.

Endamên Teatra Jiyana Nû di din zanîn ku wekî her warî şanogerên kurd jî zêdetir li kurdayetiye vedigerin û di vî warî de bingehek hatiye avakirin. Lê di warê nivîsandinê de wekî piraniya kurdan kêmasiyên wan jî hene. Tê gotin ku wê serkeftina şanogeriya kurdî, wê bibe serkeftina hunera kurdî jî.

SAMÎ BERBANG

Divê berî qanûnan mirov xwe biguherin

Ayşe Nur Zarakolu, jineke weşankar, têkoşer û şoreşger e. Nifşên nûhatî, cara pêşîn li DGM'yê ew nas kirin; ji ber kitêbên mamoste İsmail Beşikçi. Ceza li ser cezayan lê barandin, lê wê çav ji wan re neniqand û li riya xwe kudand. Di çalakiyên mafên mirovan de jî ew li paş nema, her wiha bi awayekî çalak bi siyasetê re mijûl dibe; di nava HADEP'ê de. Hevalê me METİN AKSOY li ser warên ku pê eleqedar dibe peyivî.



Ayşe Nur Zarakolu kî ye; çî karî dike? ● Bi salan e ez di şertên herî dijwar de bi helwesteke şoreşger weşankariya xwe didomînin. Xî-mê weşankariya me, li hemberî îdeolojiya Tirkiyeyê ya resmî ava bûye. Programeke ku mafên mirovan jî di nav de heye, dimeşînin. Me weşanxaneya xwe di sala 1977'an de ava kir, di sala 1982'an de cara yekemîn pirtûkeke ku me weşandiye hate belavkirin, pirtûka Mete Tuncay li ser çepgirên kevin, navê wê "Eski Sol Yeni Bilgiler" bû. Di wê demê de ji aliyê Kumandariya rêveberiya awarte (İdareya ürfî) ve hem hate qedexekirin, hem jî hate berhevkirin. Doza ku der heqê min de jî vebûbû, pişt re ket.

Di sala 1989'an de me bi pirtûka Mamoste İsmail Beşikçi re dest bi xebatê kir. Piştî demeke dirêj ev pirtûka wî ya yekemîn bû ku wê bihata weşandin. Navê pirtûkê, Mêtîngeha Navdewletî Kurdistan (Devletler Arası Sömürge Kürdistan) bû. Wê demê li aliyekî MGK, dewlet û hêzên serwer ji bo şerekî berfireh gav diavêtin, li aliyekî jî li bemberî wan, bilindbûna têkoşîna azadiyê hebû. Deriyê ku wê têkoşîna azadiyê vekiribû, bi awayekî hêz dida me. Me hem pirtûk li ser vê mijarê diwe-

şandin, hem jî me ji xwe re kire hedef ku ev kar çiqas zerarê bide me jî emê bidomînin.

Berî derketina "Qanûna Têkoşîna bi Terorê (TMY) re", 13 pirtûkên me li pey hev hatine berhevkirin, ji van 5-6 yê Mamoste İsmail Beşikçi bûn; wekî pirtûkên "Devletlerarası Sömürge Kurdistan, Muğlalı Olayı, Tunceli Ola-

Me bi pirtûka Mamoste İsmail Beşikçi re dest bi xebatê kir. Piştî demeke dirêj ev pirtûka wî ya yekemîn bû ku wê bihata weşandin. Navê wê Mêtîngeha Navdewletî Kurdistan bû. Wê demê li aliyekî MGK, dewlet û hêzên serwer ji bo şerekî berfireh gav diavêtin. Li aliyekî jî li hemberî wan bilindbûna têkoşîna azadiyê hebû.

yi, CHP Programı ve Kurdistan." Incax di qanûna TMY'ê de dema madeyên 141 û 142'yan rabûn, ew doz jî ketin. Dîsa jî me weşankariya xwe ya bi vî rengî domand. 13 heb pirtûkên ku dewletê jê hez nedikirin, me weşand. Emê vê programê heta ji destê me tê, pêk bînin.

Di vê navê de li gorî xebatên ku we kiribûn, doz li ser we vebûn, hûn hatine girtin?

● Piştî derketina TMY'ê, ji ber yekemîn pirtûka ku me weşand, ya İsmail Beşikçi bi navê "CHP programı ve Kürdistan" ez demeke dirêj girtî mam. Di dawiyê de 5 meh ceza dane min, min 40 roj li cihekî, 4 meh jî li Girtîgeha Bayrampaşayê di nav girtiyên PKK'yî yê jin de, derbas kir.

Pêvajoya ku ez di girtîgehê de mam,

ez pir tişt ji jinên PKK'yî hîn bûm. Dostaniya ku wan nişanî min da, baweriya ku wan nişanî min da, heta ku ez li jiyane bim, ezê di dilê xwe de xwedî bikim. Ew ne tenê wê di dilê min de bin, wê ji bo pêşerojê ji min re meşale bin.

Ji ber jinbûna we, tu dijwarî derketine pêş we?

● Di pêvajoya xebata min de ji ber ku ez jin bû tu dijwarî derketê pêş

min. Çunkî ez ne li gorî qanûnan, li gorî prensîbên însanî xebitîm. Dijwariyên wisa girîng derketine pêşberî min, ez bibêjim derketiye dibe derew. Lewre mirov divê pêşîn bi însaniya xwe hereket bike, wê gavê dijwariyan mirov bi xwe têk dibe. Li Tirkiyeyê îro jinên wekî me kedkar û jinên ku li nasnameya xwe xwedî derdikevin, di bin perçiqandîneke mezî de tene tunekirin. Dijwarî ev in, heke em bi hev re neçine ser wan, wê gavê maneya azadbûna bi serê xwe nîn e. Ger wisa bifikirin, "ew weşankareke jin e, di hin waran de dijwarî divê derketibin pêş wê, ji ber ku vî karî her tim mêr pêk tînin", ew raman ne rast e, çunkî ez bi mercên jiyanê dizanim û min hay ji jinbûn û însanbûna xwe heye.

İro li gorî sazûmanê, jin meta ye, di her warî de mijarên reklaman û nûçeyên magazînan e, an jî kedeke erzan e di fabrikayan de; yê ku herî zehf dixebitin û herî zehf jî tene perçiqandin ew in. Yanî mirov kare bibêje, perçiqandîna jinan du caran e, mercên ku tê de dijîn wan diperçiqîne, hem jî jin ji aliyê malbatên xwe ve, yê ku ji feodalîteyê xelas nebûne tene perçiqandin. Heke em li jinan bi çavê îdeolojiya serdest binihêrin, helbet jin nikarin li mafên xwe xwedî derkevin. Lê jin jî heke bi vî

awayî bifikirin û li mafên xwe xwedî dermekevin, ev jî kêmasiyeke wan e.

Muheqeq dijwariyên qanûnan jî hene. Ez wan baş nizanim. Qanûnên ku jinan dikine kole, bidine aliyekî, qanûnên ku li ser nasnameya wê hene muhîm in. Yanê di qanûnan de guherîn çêbe jî, problemên jinan dîsa wê bidome.. Heta jin di bîn nîrê pergala bûrjûwazî de bin, hin mafan bi dest bixin jî, wê dubendî her hebe. Ne di jiyana rojane de ne jî di çînayetiya wan de guherînek çêdibe. Dema jin vê rewşê bizanibin, jixwe qanûn ji bo wan tiştêkî îfade nake. Ew ji aliyê însanbûna xwe ve difikirin û piroblemên ku dertêne pêş wan, bi wî awayî hel dikin.

Di vê pêvajoyê de hewce ye jin çi bikin?

● Ji destê kê çi tê, divê bike. Li Kurdistanê şerekî qirêj heye. Wezîfeya jinan a herî mezin ew e ku, şer bizivirînin aştîyê. Çawa do serhildanên şer, jinan afirandin, ez bawer im, îro jî jin wê rê li ber aştîyê vekin. Lewre mirov xwedî hinek mafan be jî, heke di mêjiyê mirovan de guherînek çênebe, tu maneya wê jî nîn e. Binihêrin jinên kurd çawa şerê azadiyê zivirandin serhildanê; guherîn ev e. Do ew jin di nava şerê azadiyê de bûn, wê îro jî bi serhildanê aştîyê azad bibin. Bi serhildanê aştîyê azadbûna xwe wê bi dest bixin. Heke qanûnek ji wan re mafekî pêk bîne jî, dema guhertinek di wan de çênebe, sibê roj dema ew maf ji wan hate standin, wê li holê bimînin. Heke wan mafan di tevgerîn û jiyana jinan de guherînek çêkiribe, incax wê gavê encamekê, ew dikarin bistînin.

Hûn jinên kurd çiqas nas dikin?

● Min jinên kurd di Newroza 1992'yan de li Cizîrê dîtin û ew Newroz hem di pêvajoya şoreşa rizgariyê de demeke nû bû, hem jî ji bo pêşerojê bû çirûsk. Li wê derê jinên kurd li hemberî tîmên taybet rabûbûn, tu rêxistinên nikaribû wê serhildanê amade bikira. Tiştên ku ji wan re hatibûn gotin "Heta dawiyê hûnê bisekinin, gule jî bibarînin hûn ji cihê xwe nalibitin", pêk anîn.

Ez bi Komaleya Mafên Mirovan re û bi hin rojnamevanan re çûbûm wir. Jin li wê derê li ber tîman heta ku gule bandandin sekinîn, nedîtirsîyan. Paşê wehşetê dest pê kir, gule bi ser wan de bandandin, ew gişk di demeke kurt de belav bûn. Ev tiştêkî muthîş bû. Xwendevaniya min ku tê bîra min, livbaziyan ku me dikirin. Tu caran min rêxistineke bi vî awayî nedîtibû. Piştî re bi salan em di livbaziyan de jî, ji bo wehşeta girtîgehan, ji bo li Kurdistanê îhlalkirina mafên mirovan, ji bo rojiyên birçîbûna 10 hezaran em bi hev re bûn. Lê belê têkoşîna rizgariyê şanseke mezin bû, ji bo jinên kurd jî şanseki mezin bû û hev û du temam dikirin. Ez di vê derê de pêşveçûyîna dibînim.

Piştî çend salan ez dîsa çûme Cizîrê wan jinan ez nas kirim û tiştên ku hatibûn serê wan ji min re gotin. Nizanim, ez bawer im, ku ez wan nas dikim. Ez pir hurmetê ji wan re dikim, ew însanên muthîş bûn, mirovên ecêb bi rûmet bûn, pir bi quwet bûn. Ew bawer dikin



Binihêrin jinên kurd çawa şerê azadiyê zivirandin serhildanê, guherîn ev e. Do ew jin di nava şerê azadiyê de bûn, wê îro jî bi serhildanê aştîyê azad bibin. Heke qanûnek ji wan re mafekî pêk bîne jî, dema guhertinek di wan de çênebe, û sibê roj ew maf ji wan bê standin, wê li holê bimînin. Heke wan mafan di tevgerîn û jiyana jinan de guherînek çêkiribe, incax wê gavê encamekê, ew dikariistînin.

û ji ber baweriya xwe dibine tevgera şoreşê, vê jî pir baş pêk tînin.

Jinên kurd li aliyekî li Kurdistanê nava şerekî qirêj de ne. Ji aliyekî ve jî di nava feodalîteyê de dijîn. Di rojên pêş de ji bo ku bigihin sewiyeya medeniyeteke hemdem, hewce bi çi heye?

● Çareseriya van probleman tev, bi cihekî ve girêdayî ye; şerê azadiyê. Ez her tim mînakekê didim, di salên 1980'an de Fatsa (navçeya bajarê

Ordûyê), hûn wê demê pir ciwan bûn. Baweriya min bi şoreşa wan hebû ku ewê belav bibe. Lê belê negihîste encamekê, çûnkî bawerî tune bû, ez dîsa bawer im ku ew serhildan û şerê ku jin li Kurdistanê dikin êdî qalîkê feodalteyê şikandiye. Ez bawer im ew jin sibe roj dîsa wê bi serhildanê ji bo aştîyê, azadiya xwe bi feodalan jî bidine qebûlkirin. Ew tiştên ku min li Cizîrê dîtin, min dixwest jinên tirk jî bibînin, berxwedana ji bo azadiyê çawa dizivire li

serhildanê. Xweziya her kesî bidîta, şer ne bi tenê ji bo azadiyê ye, wî şerî nîşan da ku jin jî bi qasî mêran werêk in û ji bo azadiyê çawa bêtirs diçûne mirinê. Ez bawer im ku ew jin tu caran li ber feodalîyê serî daneynin. Êdî ew dewran derbas bû, hew tê. Pêwistiyeke wê demê ji bo me hemû jinan hebû ku em jê dersan derxin, heke me ji xwe re wek mînak hilda, îro li Tirkiyeyê wê rewşa jinan cuda bûya.

Hûn di HADEP'ê de bûne berendam. Hûn di komîsyona jinên HADEP'î de jî cih digirin, xebatên we çi ne, ji bo pêşerojê hûn çi xebatî difikirin?

● Ji bo 8'ê adarê pir çalakî hatine lidarxistin ku di van rojan de jî, gelek çalakî çêdibin. Lewre em ne tenê bi van xebatan sekinîne, xebatên me yên ku ji bo pêşerojê jî, hene û em li ser dixebitin ku tiştên baş bêne kirin. Ez di van waran de piştgiriyê didime wan û çî bar jî bikeve ser milên min ezê bikim. Ev wezîfeya min a însanî ye, yanê miroveke wekî min demokrat, şoreşger helbet divê alîkariyê bidime wan.

Wateya 8'ê adarê çi ye?

● 8'ê adarê ne rojeke ji rêzê ye. 8'ê adarê jî wekî Newrozê ye. Ew bûye sembola serhildana şerê azadiyê ji bo jinên kedkar, jinên têne perçiqandin, jinên ku janê dikişînin. Bi salan ev roj hatiye pîrozkirin, lê tu caran negihîste encamekê, çûnkî bêbawerî bû, bêarmanc bû, lê wisa tê xuyan ev roj piştî çend salan wê bibe sembola jinên ku azadiyê dixwazin. Wê bibe cejneke mezin. Di vê derê de jî ez dîsa mînaka Fatsayê bidim: Bûyera Fatsayê ji jinan re nebû simbol, lê serhildana jinên kurd ji hemû kesan re bû mînak. Ji ber vê yekê jî em deyndarên jinên kurd in, ez rûmeteke mezin didim vê pêvajoya ku wan bi me dane jiyandin.

Tê gotin ku heke pereyê jinekê hebe, ew ji hemû mafên mirovahiyê fayde di bîne. Hûn li ser vê çi karin bibêjin?

● Carekê bi wî şeklî azadî nayê qezenckirin, tiştê ku tê qezenckirin, dîsa esaret e. Ne mumkun e, yanê mirov dibê dilê eşyayekî, dilê cilekî, jinek nikare bi wî awayî azadiya xwe bi dest bixe. Bi vê ramanê incax ji xwe re dinyayeke derewîn ava dike. Ev pir girîng e, ew jinên kurd ku me di serhildanan de nas kirin, li ber deriyê girtîgehan me nas kirin, di grevên birçîbûnan de me nas kirin, di dawîya vê têkoşîna azadiyê de hem wê xwe biguherîne, hem jî ew însanên ku wê dibînin, wê biguherin. Çûnkî jinek bi serê xwe nikare xwe azad bike, ev ne mumkun e. Lewre belkî li derve xwe azad bibîne, lê di nava malbatê de hêzên serdest wê dîsa azadiya wê qedexa bikin.

Hûn ji jinên kurd re mesejê çawa dişînin?

● Îro jinên kurd hêviya me ne. Têkoşîna ku wan da, berxwedana ku wan da, îro li metropolan jî, ji bo serhildana aştîyê wê bidin. Ewê jî bi awayekî din azadiya xwe qezenc bikin û ji jinên cihanê re bibine mînak.

Banga dayika şehîdan

Ez dayika şehîdan im. Du heb lawê min şehîd in. Yek jê, sala 1993'an li herêma Pasûr (Qulpê) di agirbesta yekemîn de ji aliyê artêşa dagirker ve hate şehîdkirin. Navê wî Hebûn bû. Lawê min î mezin Abdulmenaf Zengin, ji sala 1977'an ve di nava berxwedana neteweyî de xebata xwe berdewam dikir. Ez, dayika wan jî her dem bi wan re bûm, di serhildana devê deriyê zindanan û yekîtiya malbatên girtiyan de.

Menafê min di tarîxa 16.12. 1995'an de, nêzî hilbijartinê li bajarê Mêrsînê hate girtin, di binçav de bi îşkenceyên giran tê qetilkirin. Piştî hemû kezebşewatiyan, em bi bîr û bawer in ku dara azadiyê bi xwînê tê avdan. Armanca me ev e ku, gelê me jî di nav gelê dinyayê de cihê xwe bi rûmet bistîne; ala me jî di nav ala gelan de bilind bibe. Ji bo van daxwaziyan divê hemû kurdên bixîret vê dozê bi ruh, bi can û mal xwedî bike û lê xwedî derkeve.

Şehîdê welat Menaf

*Menafê min lawo
Sîtûna malawo
Bavê ciwan û Hebûnawo
Zanayê ber destê Mazlûm û Kemalawo
Menafê min lawo
Beranê min lawo
Mêrxasê îşkencawo, zindanawo*

*Lo lo lawo
Menafo lawo
Peyayê çiyawo
Girtiyê zindanawo
Canfedayê gelê kurdawo
Menafê min lawo*

*Gelî heval û hogiran
Menafê min bi rûmet bû
Tu car jî refê hevalan li paş nemawo*

*Menafê min lawo
Mala me bûye mala şehîdawo
Menafê min lawo*

*Beranê min lawo
Hevalê Mazlûm û Agîtawo
Şehîdê zindanawo
Menafê min Lawo*


*Peyayê çiyawo
Tevgera metropolawo
Menafê min lawo
16'ê meha kanûnê êsirê destê tirkawo
Bi şev e lawo, bi roj e lawo*

*Menafê min lawo
Hesreta te heyfa dayika te sax be
ji dilê wê dernayê lawo*

*Menafo lawo
Şehîdê zindanawo*

*Gelê Kurdistanê
Ji xopana bajarê Mêrsînê
Min cendekê Menafê xwe hilgirt
Di bin çekê artêşa tirka de bir
Kurdistanê*

*Bajarê Batmanê
Li hember dijmin lîland*



*Bi sê destmalan pêçand
Bi keskûsorûzer xemiland
Ku wesiyeta Menafê xwe bi cih anî
Lawo li erdê namîne heyfa şehîdê
Kurdistan
Bawerî pir mezin e ber bi ezman*

*Dayika Şehîd Mahdiya
û Şair Azad Şîrîn*

Li Serhedê roj zer dikene

Ev bi hezaran sal in dijmin, şara welatê me li xwe pêçaye; ev donzdeh sal in ku dayika mezin bi azadiyê hamîle ye, çil milyon insan li benda zayîna mezin e. Bi qasî çar hezaran roj in esman di ser sewalên şewitandî de, bi cêran hêstiran dibarînin; her rojek bi qasî temenekî li welatê me dirêj e, her rojek bi qasî bêhnvedanekê kin e. Çar hezar û çend roj in; şêst hezar Dehak in, dusêd hezar ziya (marên mezin) li welatê me hatine xezabê...

Her şehîdek li gula azadiyê dibîşkiwe, her şehîdek di ruhê dergûşeke nûhatî de dubare mezin dibe. Çerxa welatê me diranên Zîne ne, di sêvên Xelatê de. Her şev şehîdek mêvan e ji xewnên dagirtî re; nihêrîn û awirên wan sûretên têkoşînê ne, destanên rizgariyê ne. Her roj diyarek e di rûpelên rojnameyan de, tiştêkî ji mirov re dibêje: "Hêviya welat sond e..."

Beriya sê salan ez li gundekî mêvan bûm. Demsala zivistanê li Serhedê demsala çirok û destanan e. Dayika hevalê min, serpêhatiya xwe ya havînê, ya li zozanan, ji me re qise dikir:

- Bi Xwedê, çer çavên min li qorûçiya ket, min bi niyeta wan dizanibû. Agir berdan konan. Min dua kirin, Xwedê dê Doğan di gazî û hawara me de bişîne, paşê min hişê xwe da serê xwe û bi xwe min got, "Ma em ne dayikên Doğan in." Bi Xwedê min tifi nav çavên qorûciyê nas kir û konê xwe ji nava destên wan kişand.

Bavê hevalê min bi qerfok:

- Erê erê tu ji zû de jêhatî yî!

Pîreka wî bi madeyeke tal û tîrş, "De ez nizamî hûnê çî çax çavên xwe vekin. Hûn navê heq û Xwedê ji devên



xwe dernaxin. De te halê me pîrekan bidîya... Ew dewlet û qorûci ne, ne werê ye?"

Di ser axaftina wan de Edoyê Sêwî ket hundir. Pejmûrde bûbû, çavên wî berbîjêr de daketin, bi dengêkî nizm: "Me bihist ku du heb zarên serê çiyar li gundê Baskanê şehîd ketine", got. Heste di destê hevalê min de ket, çav lê tîjî bûn, bi destekî porê xwe, bi destekî jî simbelên xwe dikişandin.

Serê me her kesî kete nava çokên me. Bavê hevalê min bêdengî xera kir û wiha got:

- Xwedê malê li xayînan xera bike. Heta kok li me cahil û bêbextan neyê, wê halê me ev rêx be.

Ez û hevalê xwe derketin derveyî xanî. Tava heyvê berf dibiriqand. Sir û seqemeke xedar hebû. Me piştên xwe bi diwar ve kuta. Çavên me kûr û dûr li

tanga gundê Baskanê bû.

Hevalê min ji hêlek ve bi bêvila solê xwe berf vedida, ji hêlekê ve jî diaxivî: "Ew e ew, jixwe Doğan û hevaleyê din di vî warî de bûn, çawa Doğan çawa...", got.

Kulmek berf di destê xwe de şidand û dilopên berfê di ser sînga xwe de dibarand. Bi kelegirî mijûliya xwe dom kir:

- Divê te ew bidîtiya heval, dîtin û bihistin ne wekî hev e. Belê jana tevan yek e, lê ew egîtê egîtan bû. Carekê hatibû, ha li wê deverê, bi qasî sê saetan li benda derketina min, li derve mabû. Di dema fermandariya xwe de, tu biryareke xelet nestand. Tîrsa ku wî da xayînan û dijminan, ta mirina wan ji wan re bes e. Ne diwestiya û ne jî xwe di bin siya fermandariyê de vedîşart. Deqe û saniye vala nedima."

Dotira rojê em diçûn navçeya jêr Me nêzikahî li Pira Evidirehman Paşa kir, hevalê min got:

- Ev pir çawa bû şahidê girtina Şêx Seîd, çawa bû şahidê xayîntiya Qaso, wisa jî bû şahidê tolhildana hemû şehîdan. Şervanên Doğan an şervanên azadiyê, li ser vê pirê heyf hilanîn. Wê gundê Baskanê jî bibe şahid...

Navçe ker û lal bûbû. Lawê welat, hezkiriyê not û neh gundan, şehîd ketibû.

Tu kesî bawer nedikir ku, ew miribe, kesî nedixweste bawer bike. Li nik her kesî çirokek ji bo wî hebû. Ew hem dozger û dadgerê tîkiliyên civakî bû, hem fermandar bû, hem jî şopa roja xelasiyê bû.

Bav û kalên me çirokên xwe yê leşkeriyê ji bîr biribûn. Tu kesî zarokên xwe bi tîrsa leşkerên romê, lala nedikirin. Dîlanan, bi bîranînan dest pê dikirin, destanên nûjen xwîna sor bûn di çeperên canê mirovên me de.

Dayika wî xweşmêrî, ji kêfa xwînxwaran re bûbû jar, bûbû kul... Dema bav û dayika Doğan çûbûn meytê wî hildin, dilrêş û qeseban bi meraq li wan nihêribûn. Dayika wî lingên xwe li ber serê şehîd dabû û wiha qîriya bû:

-Di tadikê erdê de, di tadikê erdê de...

Ev bersiv, ev peyvên dirokî derb û guleyên devê tîfinga Doğan bûn, ku di dilê dijmin de careke din diteqiyân.

Beriya sê salan bû heval/ berf sar dibarî/ Serhed bi hawar bû/

Kî miribû, kî nemiribû/ tu kes nemiriye heval/ hiç kes nemiriye/ paşilên dayikan germ in/ welat kesk dibîşkiwe/ roj zer dikene.

JÊHAT GIMGIM



NAVENDA Çanda Mezopotamya (NÇM), piştî ku cihêkî nû ji xwe re vekir û bû xwediyê salonekê, dest bi çalakiyên çandî û hunerî kir. Hemen her roj çalakiyekê pêşkêşî çandhez û hunerhezan dike. Ji aliyê din ve, sazî ne tenê cih dide xebat û çalakiyên komên xwe, cih dide kes û komên ku li derveyî saziyê xebatên xwe didomînin jî. Ev hefte NÇM çalakiyên li jêrê pêşkêş dike.

● **10.03.1996/ Yekşem**

14.00: NÇM, konsera muzîkê "Koma Rojhilat"

19.00: NÇM, xwarin

● **12.03.1996/ Sêşem**

18.30: Filmê belgewartiyê, yê li ser bûyerên Taxa Gaziyê, ku par di 12'ê adarê de qewimî bû û hêzên dewletê gelek kes kuştibûn.

● **15.03.1996/ În**

18.00: NÇM, konsera muzîkê "Koma Çiya"

● **16.03.1996/ Şemî**

14.00: Bernameya Bîranîna Qetlîama Helepçeyê.

RÛDAN

Gelo Şiir jiyanê diguherîne?

TÎŞK

LERZAN JANDÎL

NASNAMEYA FÎLM

Navê film: *Il Postino (Postevan)*

Rejîsor: *Michael Radford*

Muzîk: *Luis Enrique Bacalov*

Lîstikvanên sereke: *Massimo Troisi,*

Philippe Noiret,

Maria Grazia Cucinotta

Senaryo: *Anna Pavignano,*

Michael Radford, Furio û Giacomo

Scarpelli, Massimo Troisi



Beatrice û Mario di sehneyeke film de tèn dîtin.

Van rojan di sînemayan de bi navê "Postevan" (Il Postino) filmekî şîrî tèn nîşandan. Romana Antonio Skarmeta "Il Postino di Neruda"

(Postevanê Neruda) ku li ser bûyerên rastîn hatiye nivîsîn, piştî hinek guhertinên ji aliyê senarîstan ve hatiye kişandin. Ev film di çarçoveya çiroka dostaniyê de, filmekî bêhempa ye. Her çiqas ji destpêkê heta dawiyê, di wî filmî de sistiyek hebe jî, dîsa jî, ji ber pisporiya lîstikvanên sereke, film her xwe dide temaşekirin.


Mijara film, li gundê giraveke Îtalyayê derbas dibe. Di sala 1952'an de, Hozan Pablo Neruda sirgûnî wî gundî dibe. Mario jî cahil û gundiyeke jî ve derê ye. Ew, wekî kesên ji dordora xwe, nikare masîvaniyê bike û her tim ji xebatê dûr, di nav malê de bi awayekî, xwe heps kiriye. Rojêkê ji bo ku ji xwe re li karekî din bigere, derdikeve derve û bûyera Pablo Neruda dibihîse. Piştî çend rojên din ku Neruda û jina wî tèn ve derê û bi cih dibin, Mario jî dest bi karê postevaniya Neruda dike. Ji Neruda re, ji jinan name tèn, ji çarmedorên dinyayê û Mario ji ber vê yekê dixwaze xwe nêzîkî Neruda bike û dostaniya wî bi dest bixe. Tabî bi hewlên Mario, ev dostanî pêk têt. Bi sedema vê dostaniyê, Ne-

ruda defterek diyarî postevan Mario dike û ew jî dixwaze ji hezkirîya xwe Beatrice'ê re, wekî Neruda şîran binivîsîne. Lê dike nake, nikare ve yekê pêk bîne û ji Neruda rica dike ku şîrekê jê re binivîsîne. Hozan Neruda ve yekê qebûl nake, li ser vê yekê gotina Mario gelek balkêş e: "Şiir ne malê kesê ku ew nivîsiye, yê ku pêdiviya wî pê heye."

Bi giştî mirov dikare bibêje ku film li ser tîkiliya "şairê li sirgûnê" û postevanê ku bi tewrên xwe yên zarokî ji Neruda feyz distîne û pê bergehê xwe fireh dike, her didome. Film tevî vê dostaniyê, ji aliyê siyasî ve serobinbûna dinyayê û bi aloziyê wê demê, hatiye honandin. Bi rastî jî Mario bi tewrên xwe yên zarokî û mîmîkên xwe, Neruda jî bi tewrên xwe yên dilovaniyê filmê geş û xweş dikin.

Mixabin Massimo Troisi (postevan), piştî ku kişandina film xelas dibe, di sala 1994'an di 42 saliya xwe de, krîza dil derbas dike û beriya ku filmî bibîne, diçe ser dilovaniya xwe.

AYNUR BOZKURT



Mamostayê domananê kurmancan biyene (2)

Cewabode konkret mordem nêşikîno bicêro. Jû mordem ke biwazo derheqê hê projeyan de çiyode nivisiyaye xo dest kero, mumkun niyo. Çim ke kesî, yan jî rayerberdoxanê nê projeyan derheqê nê projeyan derheqê nê projeyan de çiyê ke ganî zaf normal bêrê kerdene, nêkerdê. Ebi nivis (dokumentasyon) çiyê çin o.

- Her çiqas ke cayê xo jî nêbî, problemê politîkî yan jî şexsî yê wertê Kuramncan xo bi xo, na platform de amê qesekerdene. Bê guman ganî mordem bişikîyo her ca de probleman ser ro qese bikero, fikrê xo vaco. La belê ma ganî bimursîme ke: 1. Ma problemanê xo wertê xo de, hunake nêyamê nê platformanê niyanênan hal bikeme: 2- Ma perwerdekerdene, ziwan musayene yan jî musayene hacetê politîka mekeme.

- Mamsotayê ke kirmanckî qesê kenê, huna nakê, xo fikiriyena xo tirkî ra qut nêkerdê, cira nêkerdê. Kêmasiyade zaf girs a, hama bêhemd girs a. Nêweşiya.

- Wezeratê kulturî yê nê eyaletî derheqê kirmanckî/kirdkî musneyane de cewabode negatîf do. Sebebê xo jî no biyo. Ebi kirmanckî materyalê musnayanê çin ê! Bê guman na raşt niya. Ma naca pirtûkê ke amade kerd bî aû amêbî çapkerdene day nê mordemeka. Hama ganî ma wunciya xo vir ra mekeme ke vatena nê mordemekan de raştiye est a. Wa mamosta û pedegogê ma kerem kerê xo tenê bidêrê kar, tenê rehetê xo ra, hewnê xo ra fedekariyê bikerê. Na xal de berhemane ebi qedr bidêrê.

Serba naye jî ganî.

- Her mamostayê, her pedegogê kurmancan xo het ra bixebitiyo, produktîv bo, berhemane bidêro.

- Ganî her mamostawo kurmanc xo avê bero. Hetê Metodîk û didaktîk de, metodanê pedegojî yê newiyan ra îstifade bikero. Tim we kino, ere newetiyan bicêro.

- Ganî sentralîzasyonode zixm û aktîv bêro avakerdene. Kar ebi sîstem û sîtilanê tezan bêro kerdene û karê statistîkî profesyonel bo YMKÎ (Yekîtiya Mamostayên Kurd) derheqê karê xo, hevzê xo veciyê.

- Ganî serba zerrê meslege de avêşiyena mamosteyan rê serre de çend rey kursî, konferensî amade bê. Ebi na qeyde mamostayî şikînê zanayena xo newe kerê, hem jî înfomasyonanê xo jûbînî de biwumenê.

- Ganî problem, zahmetî û kêmasiyê domanan, ma û piyan bêrê kom kerdene. Gor welato ke tede rê, gor îhtiyaç û îmkanan çareserkerdene nînan ser ro vinderê.

- Ganî YEKMALÎ (Yekîtiya Malbatên Kurd) xo reorganîze kerê, karê sentral û îstatîstîkî bicêrê xo ser. Derheqê porblemanê domanan, mekteban, sîstemê mekteban, ma û piyan de wekintena wirazê.

- Ganî mamostayî tecrubeyanê hevelanê xo ha welat de, ma vacîme kurmanciya cêr de, ha teberê welatî de, ze Swed, Almanya ûêb. bişinasnê, nînan bixebetnê.

- Ze her karî nê karî de jî bê refleksiyan nêbeno. Ganî ha teyna ha ebi grupan yan jî zerrê grupan de kar û gurê bêrê refleksiyan kerdene.



Dîmenek ji film

Ji neyaran re tilîlî

Tariya şevê, bi tirêjen rojê, hukmê xwe hêdî hêdî winda dikir. Roj, nolî bi rîknî dixwest mirovên gund hişyar bike, tîrêja xwe di navbera perdeyan re dişand nav menzelan (odeyan).

Gundê Pîra Zeynê, gundekî gelek spehî bû. Li ser destê bi cih bûbû. Rorbara (çem) bi nav û deng Dicle, di keviya gundê wan re derbas dibû. Mirovên gund debara (îdara) xwe bi firotina berhemên şîr û çandina titûnê, dikirin. Xwezayî (tebiet) rindîtiya xwe, bi comerdî pêşkêşî wan kiribû. Daran, tevî her cureyên spîndaran, hawirdora gund girtibûn.

Pîra Zeynê not û çar salî bû. Tevî vepîrtiyê xwe, zindî bû. Her xêzê eniyê wê, her qermûçekê rûyê wê, beşeke jiyana wê vedigot. Porê wê yê hinekirî, ji çarîkê (laçîk), bi qasî bihostekê dirêj dîma. Pîra Zeynê, piştî şehîdbûna bavê xwe, soz dabû xwe, heta ku welat rizgar (xilas) nebe an jî heyfa leheng û şehîdên Serhildana (Terqa) Şêx Seîd neyê hilanîn, ew dê porê xwe nequsîne.

Pîrê, di destpêka şerê hezar û heşsed û çaran de, rojekê bangî kurê xwe kiriyê û bi kêf, porê xwe bi kurê xwe daye qusandin.

Ew roj, ev roj dilê Pîra Zeynê bi her livbaziya şervanan şad e. Pîrê, ji bo bicihanîna wesiyeta bavê xwe, bi pîsmamê xwe re zewiciye. Mêrê wê di çîlsaliya xwe de ji nexweşîna zirav çûye ser dilovaniya xwe. Di pêvajoya zewaca wê de, Xwedê tenê di sîh û neh saliya wê de, zarokêkî kur dayê. Ji wî kurê wê, ku niha keyayê gund e, sê heb neviyê wê çêbûne.

Du neviyên pîrê hene; keç û kurek. Emrê yê kur, du sal û nîv e. Hêviya Pîra Zeynê, dîtina mezinbûn û şervantiya wî ye. Lê dîtirse ku Emêr wê têr neke. Ji bo wî jî, her dem bi kurê xwe û bûka xwe Leyla re diqehire.

Li gund, ji bilî Pîra Zeynê, her kes hişyar bûbû. Leyla di nav nivînê de bi kurê xwe re mijûl dibû. Li benda hişyarbûna Pîrê bû. Ji ber ku Pîrê her dem nimêja sibehê li ber malivînkê dikir û li wê derê, li ser sicadê diniviya (radiza). Leyla, piştî di xew de çûna kurê xwe, nalîna Pîrê bihîst. Guman kir ku Pîrê hişyar bûye. Lê ev nalîn, ên pîrtiyê bûn. Leyla bi wê xapiya. Ji nivînê derket, hê çend gav bi pêş ve avêtibû ku, dengê girîna kurê xwe bihîst. Ji wî dengî Pîrê jî, ji xew rabûbû. Pîrê bi hişyarbûna xwe re, ji menzela din qijîya:

– Keçê! stûyê te şikestiyê. Tu çima li wî zarokî nanihêrî?

Leyla ji Pîrê fikare dikir û her dem bi dengê nerm, pê re dipeyivî.

– Dayê, niha min ew razand. Min dê nivîn danîna malivînkê.

Pîrê bi qehirîn:

– De here! Dêla dêl! Tu û mêrê te, hûn wekî hev in. Bi kêrî tu tiştî nayên. Ka ew cehimiye çûye ku derê?

– Wekî ku tu jî dizanî, îşev li mala me ji bo valakirina gund û koçkirina me civîn çêbibe. Ji bo wî tiştî, sibehê zû rabû çû. Dixwest gundiyan li mala wan biqefêle û wan agahdar bike.

Pîrê bi awayekî tinazî:

– Tu jî dibêjî qey ew qûnek dê me xelas bikin.

Pîra Zeynê, her dem bi awayekî eşkere dipeyivî. Li tu cihî ji gotinên xwe fikare nedikir. Her kes hînî çêr û gotinê wê bûbûn û jê nedixeyidîn.

Li aliyê din, keya gundî agahdar kiribûn û ber bi mala xwe ve dihat. Li destê xwe yê çepê nihêrî, saeta wî nîn bû. Ji lezan li malê ji bîr kiribû. Qet nedixwest êvar bibe. Rojê li ser rûyê wî

Qederek li ser kevir bêlivîn li Ronî nihêrt. Dilopek rondik ji çavên wê nehatibû. Ronî li ser çoka xwe dirêj kir, ji berîka xwe piştikek (quşaxek) bi rengên Ala Rengîn xemilandî, derxist û li serê wî yê bi xwîn, lefand. Berê xwe ber bi çiyê ve kir, laşê Ronî rakir, tîfîlyek dirêj kişand û wilo ma.

dixist û nêzî gazên rojavayê bûbû. Saet çar û nîv an jî pênc e. Hişên wî tevlihev bûn. Haya wî ji derdora wî nîn bû. Sê mêrên gundî li ber malekê rûniştî bûn û bi hev re dipeyivîn. Keya gava ku di ber wan re bihurî, bi dengê gundiyeke veciniqî.

– Oxir be Keya!

Keya, li wan zivirî û got:

– Merheba ji we re. Hûn li vê çî dikin lo?

Gundî gişan bi hev re silav lê zivirandin û yekî ji wan got:

– Ka were rûne, em hinek bipeyivin.

Keya: “Divê ez biçûma malê, amadekariya civînê bikim”, got û meşa xwe domand. Gundiye ku dixwest pê re bipeyive, bi gavên lezgîn gihîştê û di ber guhê wî de wiha got:

– Tu bi xatirê Xwedê bikî, Pîra Zeynê bila nekeve civîna me.

– Çima? Çi bû?, got Keya.

– Ji tiştî bûyîne mîn e. Ew di civînan de nahêle em bipeyivin. Her dem bi gotinên xwe, bi ser me ve tê û me rezîl û rûswa dike.

Keya bi meşa xwe re jî, dibişirî. Dizaniyê ku ew çî jî bike, Pîrê wekî her gav dê di civînê de cih bistîne û bipeyivî.

ve.

Keya gava gihîşt malê, Leyla şiv amade kiribû. Li dû destşûştinê, tev bi hev re rûniştin. Hê ji xwarina xwe tu çêj (tam) nestandibûn û du sê loq xwaribûn nexwaribûn, dengê lêdana derî hat. Keya ji ser sifrê rabû, derkete hewşê û berî vekirina derî pirs kir:

– Ew kî ye?

– Jandarma, got ê ber derî.

Keya derî vekir. Sê heb leşker li ber derî bûn. Hin ji wan jî li kuçe û pişt sincan xwe veşartibûn. Keya ew dîtî. Tiştêk eşkere nekir û ew bi gotina “bûyurun çeri” (Kerem bikin), vexwende (dawetî) hundir.

– Hayir çeri girmiyeyeçêz, bizi ast-subayım gönderdi. Yarın yüzbaşı köye gelecek ve size köyü boşaltmanız için son uyarıyı yapacak. Size bildirmemizi istedi ve gerisini onlar düşünsün dedi. (Na em dê nekevîne hundir, zabîte min, em şandin. Sibehê dê yuzbaşî were

– Pîrê weleh me jî, ji vî tiştî re tu çareyek nedît.

Pîrê li ser gotina yê gundî hêrs bû, piyala (qedeh) çayê danî erdê û got:

– Hûn dê gundê xwe yê hezar salan bihêlin? Wê hestiyên kalkalikê we, di nava goran de bilerize? Ev ax û ev welat ê me ye. Xwîna hezaran şehîdan lê rijiyaye. Niha jî, bi hezaran ciwan ji bo vê axa pîroz şer dikin.

Keya peyva Pîrê birî û got:

– Dayê ma em ew qas jî bêxîret in? Gotinên te rast in. Lê em gund vala nekin, leşker şevkê bi bombe û bi çekên kîmyewî dê me bikujin, dê me bişewitînin. Divê em li jin û zarokên xwe jî bifikirin. Li welatê biyan (xerîb) jiyana zehmet e. Em di nava hev de biryar bigirin. Da ku em tev di bajar an bajarokekî de bi cih bibin, em dê karibin bi hêsanî jiyana xwe bidomînin.

Pîrê ji enir û berketinê, dilerizî. Ji cihê xwe rabû, ber bi derî ve çû, li civatê zivirî!

– Hûn jiyana bêrûmet dipejirînin (qebûl dikin). Tifû! Xwelî li serê we be. De rabin herin paşilên jinên xwe, ku hê leşker neketine gund, got û ji menzelê derket.

Gundiyan gişan ji Keya gazinc kirin. Civat qaseke din jî rûnişt û derengî şevê belav bû. Keya li menzelê tenê mabû. Ew jî rabû, çû menzela raketinê; xwe li ba Leylayê dirêj kir. Hişên wî bela wela bûbûn. Leylayê, bi mistdana sînga wî, demekê ew teselî kir. Çi feyde ev jî, ji berketina Keya re nedibû çare. Li Leylayê nihêrî, xwest ku jê re hin tiştan bibêje, lê zimanê wî negeriya. Leyla, ji vê yekê tê gihîşt. Serê xwe danî ser sînga wî û got:

– Her çendî Pîrê helwesteke (tewreke) wiha deyne û bi vî awayî bipeyivî jî, ew jî dizane ku bêçek (bêsilêh) û bêhêz berxwedan dijwar e. Tu qet bi ber xwe nekeve, wê roj were em dê bi gerdazayî veqerine gundê xwe. Ez bawer im, ew roj pir ne dût in. Divê îro em, ji rojên din herî bi hêz bin. Ji hev re bibin destek. Tu dê bibînî Pîrê sibehê fikra xwe biguherîne.

Leyla li dû gotinên xwe yên dawî, bi çavên evîni li Keya nihêrî. Çavên Keya hatibûn girtin û dan û standina hilma (nefes) wî, giran bûbû. Axaftina Leylayê jê re bûbû wekî loriyekê. Leyla ji vê yekê pir kêfxweş bû û ramûsanek li rûyê Keya danî. Demekê bi zarokên xwe re mijûl bû. Pişt re cihê mêrê xwe rast kir, mêşên ser rûyê wî qewirandin û bi çarîkekê (laçîk) rûyê wî nixumand. Ji cihê xwe rabû, çû ber şibakê (pacê) li derve nihêrî. Esmen sayî bû. Stêrk dibiriqîn û nîvheyv hebû. “Sib tê bi xêr tê”, got xwe bi xwe. Porê xwe berhev kir, bi

lastikekê girê da û xwe li ba Keya dirêj kir. Keya bi hatina Leyla hişyar bû û ew hambêz kir. Demekê bêxemberdan li hev û din nihêrîn û bi wî şeklî di xew de çûn.

Mirovên gund amadekariya koçkirinê, dikirin. Keç û jin, bi berhevkirina pot û pertalan mijûl dibûn. Mêr, di nav de du mirov bijartibûn û ew şandibûn navçeyê. Ew her du kes, ji bo barkirinê dê kamyon peyda bikirana. Li gund, yê ku karek nedikirin, Pîrê bû. Li gastîna (meydana) gund li ser kevirêkî rûniştî bû. Zarokên gund li dora xwe civandibûn û ji wan re wiha digot:

– Heta niha me bi rûmeta xwe jiyan xwe didomand. Lê îro leşker, me ji welat û gundê me derdixin. Em gelê kurd, tim û tim bi nefikirinê (sirgûn) re rû bi rû mane. Emrê min li ber qedandinê ye. Divê hûn li welatê din, xwe winda nekin. Her dem bi zimanê xwe yê kurdî bipeyivin. Dema ku hûn ketin ciwaniya xwe, wekî lehengên çiyê heyfa şehîdên xwe hildin. Ev gotin ji we tevan re, wesiyeta min e.

Keçeke pênc salî li pey gotinên Pîrê, bi dengê xwe yê zirav û germ jê pirsî.

– Pîrê, em keç jî dikarin bi mêran re herin?

Pîra Zeynê, bi awayekî xemgînî bişirî. Bi çavên ponijîn li çiyê nihêrt. Kelegirî bû. Dema panzdeh saliya wê, hate bîra wê. Çawa li pey bavê xwe çûbû. Çiqas xwestibû ew jî bi bavê xwe re here; di Serhildana Şêx Seîd de şervantiyê bike. Çi feyde bavê wê nehiştibû. Ev yek di dilê wî de bûbû kul. Qederekê bi

wî awayî bédeng sekinî. Ji dûr ve dengê erebeyan dihatin. Zarokan jî bala xwe dabûn wan dangan. Pîrê, çawa ku qet nebihîstiye peyva xwe domand.

– Keçê tu çi dibêjî? Ger ku hûn keç, ji mêran re nebîne destek, di şer de tu car serkeftin bi dest nakeve. Li aliyê din, pevra hûn jin û mêr, xweşiya jiyanê tinin.

Pîrê gotina xwe qedandibû. Serê xwe xwar kir û bi darikê destê xwe ax kola. Dengê erebeyan êdî ji nêzik ve di hate bihistin. Qasek bi şûn de gihîştin gastîna gund.

Ji erebeyan bi sedan leşker peya bûn û dora gund girtin. Zarok ji tirsan, bi bazdan çûn malên xwe. Pîrê di cihê xwe de ma û ji leşkeran qet paxaf nekir. Yuzbaşî bi du heb astsubayan ve ji cîpa xwe peya bû, ber bi Pîrê ve meşiya û got:

– Hey kadîn! Köylüler nerede? (Hey hermet! Gundî li ku ne?)

Pîrê ji zimanê tirkî hinekî fêhm dikir, lê nedipeyivî. Li wan nihêrî, tûka xwe avêt erdê û pirs bêbersiv hişt.

Keya bi çend gundiyan re çûbû mizgefta gund. Li wê derê, ji bo gava ku ji wan tiştêk were pirsîn, gotinên xwe kirin yek. Ji hatina leşkeran hisiyabûn. Yuzbaşî bi qîjîn ji deh leşkeran re ferman da ku biçine malan; zarok, jin û mêran, tev li gastîna gund berhev bikin. Keya ev ferman bihist. Bi gavên bazdanî hat ba yuzbaşî û got:

– Komutan niçin kadîn ve çocukları topluyorsunuz? Ben köy ihtiyar heyetini topluyayım. Bu yeterlidir. (Kuman-

dar hûn çima jin û zarokan dicivînin? Ez rûspiyan gund bicivînin. Ev bes in.)

Yuzbaşî:

– Hayır! Herkes gelecek. Burda oturan kadîn kim? (Na divê herkes were. Ev jinika ku li virê rûdine kî ye?)

Keya:

– Anamdır, (Diya min e.) got.

Li aliyê din leşkeran, mirov anîn qada gund û tevî leşkerên din, li pişt wan bi awayê dorgirtinê ketin rêzê. Yek ji leşkeran got:

– Hepsini getirdik komutanım. (Me hemû anîn kumandarê min.)

Yuzbaşî li Pîrê zivirî û bi dengêkî fermanî.

– Kadîn sende onların yanına git! (Hermet tu jî here cem wan!)

Pîrê ji cihê xwe neleqîya. Serê xwe rakir û li çiya nihêrt. Ji hêrsan darikê destê xwe li erdê xist.

Keya:

– Dayê ka here ba Ronî rûne.

Pîrê çawa navê neviyê xwe bihist rabû piya û darikê destê xwe ber bi çiyê ve kir, wek avêtina dirûsmê qîjiya.

–Xwedê alîkarê we be ey mirovên leheng!. Hûn hêviya welatê me ne. Ez bawer im hûn dê heyfa me yê hezar salan hildin.

Yuzbaşî, ji vê yekê aciz bû. Kir ku bi çeka xwe li Pîrê de, Leyla qîjiya;

– Dayêêêêê...

Pîrê bi dengê Leyla li Yuzbaşî zivirî û got:

– Lê de qûndeyê qûnde. Destê we dirêjî me jinan dibe.

Yuzbaşî li leşkerên xwe zivirî. Keya

têgihîşt ku wê tiştên ne baş bike, bi çepilê Pîrê girt û bi nîvkaşkirinê ew bir ba Leyla. Yuzbaşî, te digot qey bi Pîrê re pêşbazî dikir. Lingê xwe yê rastê danî ser kevirê ku Pîrê li serê rûniştî bû. Çavên xwe li gundiyan gerand û got:

– Size bir hafta süre tanyorum. Bu süre içerisinde hepiniz köyü terk edeceksiniz. Aksi halde sizi de köyle birlikte yakarım. (Ez hefteyekê muhlet didime we, hûn eger gund vala nekin, ez dê tevî gund we jî bişewitînim.)

Leyla bi dengêkî biryardar got:

– Jixwe bi dîrxistina ji axa me, hûn me dişewitînin. Bila mirin li ser vê axa pîroz be.


Yuzbaşî, ji enirê dîn û har bûbû. Du, sê gav ber bi Leyla ve avêt, nişka ve demançaya xwe ji kewdanê derxist û sê gule berî wê da. Leyla li ser çonga xwe rûnişt û rûyê xwe li sînga Ronî dada. Serê Ronî paş ve ket. Pîrê bi tebatî neviyê xwe jî hambêza Leyla girt. Ronî bêcan bû. Guleyek li serê wî ketibû. Pîrê laşê Ronî hambêz kir û çû li ser kevirê navîn a qadê rûnişt.

Qederekê li ser kevirê bêlîvîn li Ronî nihêrt. Dilopek rondik (histêr) ji çavên wê nehatibû. Ronî li ser çoka xwe dirêj kir, ji berîka xwe piştikek (quşaxek) bi rengên Ala Rengîn xemilandî, derxist û li serê wî yê bi xwîn, lefand. Berê xwe ber bi çiyê ve kir, laşê Ronî bi her du destên xwe rakir, tîflîyeke dirêj kişand û wilo ma.

DİLAWER

Zimanê zikmakî afirandina taybet ya Xweda ye

CELALETTİN YÖYLER




O la îslamê tu demê astengî û çeperan dernaxe pêşberî xebitandina zimanê tu kesî. Bi ser de alîkar û piştevaniyê jî ji bo xebitandina zimanan û gelan dike. Ji ber ku ev mafê axaftina bi zimanê zikmakî ji wan mafên taybet e ku bi kesên re hatine afirandin. Ew maf jî dema ku mirov hatine afirandin û derketine ser rûyê cîhanê bi wan re derketiye holê. Ji dayika xwe hînbûna zimên di domandina jiyana gelan û kesên de, heyîneke gelek girîng û berz e. Belkî jiyana bi wî rind û xweş e, bê wî jiyana nezanî, bindestî û koletî ye. Ji bo serbestî û azadkirina zimanê zikmakî mirov ger xwe cangorî jî bike, hêja ye.

Ji ber ku ew jî yek ji afirandinên Xweda ye, înkara wî bédadî ye li dijî dadmendîya Xweda. Çawa ku Xweda di ayeteteke Qurana pîroz de wiha diibêje: "Ji ayetên Xwedan e afirandina ezman û zemîn û

newekhevbûna ziman û rengan. Bi rastî jî her di van curbicuriyan de nîşan û ayetên Xweda hene, ji bo hemû giyanewerên cîhanê." erum: 22. Afirandina ziman û rengên kesên bi awayekî cur be cur û reng û reng e. Afirandina zimanê kesên wekî afirandina asîman û qadê, afirandineke taybetî tê ravekirin. Bi serbestî axivîna bi zimanê zikmakî jî fermana Xweda ye. Tu kesek ji mirovan nikare destê xwe dirêjê bike. Qedexekirina vê heyîna girîng û mezin bédadî ye. Hem kes nikare qedexê bike, hem jî nikare biguherîne û bihelîne, ji ber ku ew jî fermana Xweda, ji aliyê Xweda ve ji mirovan re hatiye pêşkêşkirin. Çawa ku Ebul Hesenê Eşarî di pirtûka xwe de gotiye: "Ziman wahî ye ji bal Xweda, ji bendeyan re. Wekî çawa Xweda ji bendeyan re şandiyê evê cîhanê dema ku wan afirandiyê lê belê ewan dijwarî hovîtiyên ku tene kirinê ji aliyê hinekî gelên nijadperest ve li ser zimanên hinekî gelan ew her ji waswasên wanên şeytaniyên siyasî ne, ji bo ku ewan gelan mehkûmkirinên bindestkirinên xwe ji xwe re têxin kole û zimanên wan bihelînin asîmîle bikin yanî ji bo zagonên xweyên şeytanî zimanên wan qedexê dikin. Ev rewşa hanê jî bêbatîyeke gelek mezin e ku ew jî ji afir-

randinê ewan teba û tarişane, ku bi derewan jî navê ewê zagona xwe ya bi gemarî jî datînine medeniyet? Ew bédadî û dijwariya ku zimanê kesên re bê kirinê ew her serhildan û li hember derketina ferman û rîya Xweda, ew rîya ku Xweda bi zagoneke dadî û taybetî daniye ji hemû gelan re bêcudatiyê, wekî afirandina wî ya kesên, bi renga rengî.

Êl û gel, hem jî bi curbicurbûna rengan û zimanan, hemû nexş û nemûşên Xweda ne. Wî ew afirandine û derxistiye holê. Ew kesê ku li hemberî van hebûnan derkeve, hem jî yek ji van hebûnan Xweda yê bi rûmet derkeve, wê demê li ser her misilmanî û herkesî ferz e ku ew li hemberî vê bédadiyê derkeve, heyânî ku wî bînin ser rîya rastî. Lewre ew hebûn, hebûnên wisa girîng in tu demê ne tene guhertin, ne jî tene cudakirin ji jiyana kesên. Ew kesê ku bi hovîti bixwaze êrîş bike ser van heyînan girîng, bar e li ser her kesî ku têkoşinê li dar bixe li hemberî wan kesên zordest. Gelê ku êrîşeke bédad li ser zimanê gelên bindest dimeşînin, ew gela çî misilman, çî ne misilman di ola îslamê de pêwîst e ku pê re cengê bê kirinê. Cenga divê bê meşandinê heyânî ku ew bédad dest ji bédadiyê berdin, werin ser rîya Xweda.



Tûjtûjî

Du zilam, li ser bênderan digeriyan. Stiriye Agûlê bala yekî kişand û ji hevalê xwe re got: "Hevalo, ma şuxilê Xwedê ji tûjkirina van stiriyan pê ve nîn e. Çawa van giştan tûj dike?" Hevalê wî bersiva wî da û got: "Xwedê dibêje tûj û tûj."

Min qeysa lingê xwe ji bîr kiribû!

- Zilamek wê here bajêr asûkên xwe bikire û di nav asûkan de sola wî jî heye. Qeysa lingê xwe jî digire. Dor tê ser sola wî. Digere nagere qeysa lingê xwe nabîne. Solê ji xwe re nakire û tê malê. Jina wî jê dipirse: "Ka te ji xwe re sol nekiriye?" "Ma ne min qeysa lingê xwe li mal ji bîr

kiribû", dibêje jina xwe.

Maşallah çoxtur

Kumandarekî leşkeran diçe gundekî. Ji gundiyan re dibêje, "Bangî muxtar bikin bila bê." Bangî muxtar dikin, kumandan jê re dibêje: "Muxtar! Dibêjm ku telebe li gundê we hene?"

-Maşallah çoxtir kumandan (Maşallah pir in kumandan.)

- Öyleyse çağır onlari (Ê de hela bangî wan bike.)

Zarok dicivin ser hev û tèn ba kumandan. Kumandan dibêje: "Bu ne? Ben senden ne istedim, sen ne getirdin? (Ev çi ye? Min ji te çi xwestin, te çi anîn ji min re.)"

BERHEVKAR:
M. MAZHAR

Tûrîstên niştecih

Li wanê, navçeya Özalpê gundê Melehesenê sê gundî, diçin Wanê, dîkewine behrê. Yek dêhna xwe didê, wapûr li wê derê sekiniye, dibêje yê din: "Ka em herin lê binêrin çawa ye."

Diçin lê siwar dibin, dema ew siwar dibin, wapûr diçe. Gundiyê me di nav de dimînin û tazî ne jî. Bi tenê mayo li wan heye, kincên wan dimînin li devê behrê.

Gundiyeên me heta Tetwanê di-

çin. Li Tetwanê peya dibin, diçin ku bi erebê herin Wanê. Dema dema nava Tetwanê re tazî derbas dibin. Tetwanî dibêjin qey ew tûrîst in. Bang li wan dikin: "Okê okê a man."

Ev jî dibêjin: "Na na, ne okê a man! Keşîş, Melhesen, Hespîstan kurd, wan elhemdûlillah misilmînan (Keşîş û Hespîstan gundê dorane)

BERHEVKAR
DAVUT ÖZALP

Eyndarin yolî

Seperze ev 20 sal bûn ku ji Misircê derketibû. Piştî 20 salan, berê xwe da Misircê, li gundê Eyndarê Şeperze ji otobûsa Siirt Petrolê peya bû. Guhertina Misircê hiş û aqil pê re nehişt.

Piştî dîtina kesên naskirî, çû xeraja gundan, li dolmîşa Bêkendê siwar bû, li dawiya Bêkendê peya bû.

Dawiya riya dolmîşê bû. Peya çû çû hey çû, leqayî rênçberêkî hat di nava bostanan de, nesekimî piştî (ji tirkiya xwe jî zehf qayî e):

-Xalo! Xalo anaya babaya rehetmet! Eyndarin yolî nerde?...

Xalo piştî vê gotina ehmeqî jixwe qayî aciz bû, bersiva wî da:

- Lawo, hema şu tepey biqulibe, gund e!...

SALIHÊ KEVIRBIR

XELAT...

1	H	R	A	M	Ç	A	D	I	
2	S	A	D	Ü	M	A	N	T	
3	Ç	A	D	S	Î	N	E	G	O
4	N	E	M	I	R	D	O	L	
5	Â	N	E	L	T	E	R	T	
6	U	S	A	B	A	L			
7	E	R	Î	S	K	A	R		
8	Î	N	A	N	A	P			
9	Û	G	O	R	M	E			

Bersiva Xaçepirsê (6)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 8'an kitêba Cegerxwîn "Şiirên Windabûyî" ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.


Kesên ku xelata xaçepirsa 6'an kitêba Reşidê Kurd "Ez" gezenê kirine: **N. Boz/Izmir**, Burhan Oral/Istanbul, Osman Avcı/Batman, Mustafa Kara/Konya, Baha Muzlu/Bitlis, Nimet Yılmaz/Izmir, Yusuf Savaş/Ağrı, Şahin Yazar/Adıyaman, Sadık Ekinci/Şanhurfa, Abdurahman Ağdaş/Mardin


XAÇEPIRSA BIXELAT (8)

XAÇEPIRSA

Huner-mendê kurd (wêne) İbadetxane	Cinavkek Sembola Radonê	Madeya herî biçûk Kilam	Notayek Girs bi îngilîzî	Hîdrojen Dewletek	Kesê İtalyan
2					Gelek li Ewrûpayê
Rojek		Pê masî digirin		Şanoyeke tirkan	
Cejn		Hêsan		Encam	
	Enstrûmanek				4
	Alîkar				
Qanûn			Keştiyê cengê		
Kûrahî			Vê carê		
5				Ji binî	
				Medeniye-teke kevin	
Qebî			İstixbarata Amerika		
Sehne			Partiyeke tirkan		
	1	Navekî biyan Yezdanê Misrê			
Pers				Xwendina tîpekî	6
Gîhanekek					
	Celebeke muzîkê				
				Bi tirki hesp	

PEYVA VEŞARÎ





Azadiya welat azadiya gel e

Bi rastî gelê kurd ji azadiyê re tî bûye. Ev ne demekî kurt e, lê belê ji sed salan vir de ev tîmayîn berdeham dike. Bi gelê kurd ve girêdahî, gelê tirk jî her wiha ji azadiyê re tî ye. Di wela-tekî wekî Tirkiye û Kurdistanê de, bi navê azadiyê karkirin, hem nehêsan e û hem jî zor giranbuha ye.

Tirkiye di demeke gelek tengav de derbas dibe. Di warê polîtîkayê de wekî baş tê zanîn, valahiyêke mezin heye. Sedemê vê valahiyê jî şerê qirêj e. Ji ber ku li hemberî şer ji her aliyê ve asteng dedikevin ber wê, Tirkiye roj bi roj ber bi rewşêke xerabûnê ve diçe. Tu partî naxwazin berpirsiyariyê hildin ser milê xwe.

Di van rojan de ger hikûmet çêbibe jî, ev ne bi daxwaziyê, ji mecbûriyetê ye. Şerê qirêj yê ku li Kurdistanê tê meşandin, bûye sedema têkçûna aboriyê jî. Ne tenê dewlet, her wiha ji gelê tirk û yên din jî, jê zera dibe, ten-gasiyê dikişînin. Kes li propagandaya dewletê nenihêre û xwe pê nexapîne.

Dewleta tirk nikare zikê leşker û memûrên xwe tîr bike. Lê belê, şahiyêke mezin tê li darxistin; ji ber ku Tirkiye ketiyê nava Yekîtiya Gumrika Ewrûpayê. Ev şahî bi armanca gelxapî-nê tê lidarxistin. Qebûlkirina Tirkiyeyê nava Yekîtiya Gumrika Ewrûpayê, ji

Dewleta tirk nikare zikê leşker û memûrên xwe tîr bike. Lê belê, şahiyêke mezin tê li darxistin, ji ber ku Tirkiye ketiyê nava Yekîtiya Gumrika Ewrûpayê. Ev şahî bi armanca gelxapî-nê tê lidarxistin. Qebûlkirina Tirkiyeyê nava Yekîtiya Gumrika Ewrûpayê ji terefê dewletê ve, wekî rizgariya gelê Tirkiyeyê hat dîtin. Di televîzyon û rojnameyên tirk de, bir rojan nûçe û programên taybet hatin weşandin.

terefê dewletê ve, wekî rizgariya gelê Tirkiyeyê hat dîtin. Di televîzyon û rojnameyên tirk de, bir rojan nûçe û programên taybet hatin weşandin.

Gelê tirk û gelê kurd jî pêwîst e baş bizanibe ku, dewlet û sazîyên wê bi xwe ne bawer in ku ji gel re berpirsiyariyê bikin. Zêdetir rizgarî ji dewletên Ewrûpayê tê xwestin û dîtin. Di vir de, pêwîst e gelên ku li Tirkiyeyê dijîn, dewleta tirk baş nas bikin û azadî ji bo gelên Tirkiyeyê jî zor pêwîst e.

Bûyerên di cihanê de tîr dîtin, baş didin kifşîkirin ku mirovahî roj bi roj hîn bêhtir bi pêş dikeve. Gelê kurd, yê ku di dîroka xwe de tim jî mafên xwe yên mirovahiyê hatiye dûrxistin, roj bi roj dibe xwedan hêz û bi alîkariya qeweta xwe ya gelêrî, mafên xwe distîne. Bi taybetî, sala 1995'an ji bo gelê kurd bû saleke giranbuha. Bûyerên ku hatin

dîtin di sala 1995'an de, vê yekê baş didin xuyakirin.

Dema kesek bi zanebûn nêzikî di sala par de bide, ev pêşveçûn wê baş werin dîtin. Hem di warê avakirina sazîyên neteweyî de û hem jî di warê leşkerî de gavên mezin hatine avêtin. Ji aliyê din ve, li derveyî welat di warê dîplomasî û polîtîkaya navneteweyî de jî karekî xurt hatiye meşandin.

Em dikarin bibêjin gelê kurd bûyerên di dîroka xwe de hê nedîtibû, di sala 1995'an de dît û ji avakirina Parle-mentoya Kurdistanê li Derveyî Welêt (PKDW), vekirina MED-TV'yê, Ope-rasyonên Birûskî li Başûrê Kurdistanê, şer-rawestandî û her wiha bi dehan gavên din di sala 1995'an de hatin avêtin.

Sala 95'an ji sala 96'an re bingehê-ke xurt ava kiriye. Li ser vê bingehê, ev

sala em tê de dijîn, wê bi serkeftin bi-be. Bes ku gelê kurd bi zanebûn xwe nêzikî demê bike û di çarçoveya îmkânên xwe de karê welatparêziyê bine cih. Ev sal ji bo gelê tirk jî, em bawer in ewê bibe destpêka avakirina demok-rasiyê û parastina mafên wî yên însanî.

Bûyer didin kifşê ku hikûmeta şerê taybetî hîn bêhtir hişk dibe û li dijî gelan zor, zîlm û qetlîman dimeşîne. Ne îro, ji avakirina Komara Tirk vir ve, ev daxwaz heye û bi qasî ku kar pê bûye, pêk aniye. Lê belê, dema gel bi qeweta xwe bihesin û bixwazin li hemberî zor-dariyê têkoşînê bimesînin, tiştêkî ku nikaribe pêk bîne, tune ye.

Li ser vê rastiyê em bawer in hem gelê kurd û hem jî gelê tirk baş hişyar bûne û bi zanebûn dikarin nêzikî demê bibin.

Belê, sala 1996'an wê li gelek bûyerên giranbuha xwedîtî bike. Destpêka weşana rojnameya bi zimanê kurdî Azadiya Welat jî, ji van bûyeran yek e. Hemû rewşên bîr û kesên zane, yên ji bo azadî, demokrasî û mafên mirovan, pêwîst e xwe ji bo sala 1996'an amade bikin. Ez bawer im rojnameya Azadiya Welat jî roleke girîng wê di vê salê de bilîze.

AHMET DERE
MOSKOVA

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR
Berpîrsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

Helebçe hê jî hestiran dide barandin



Şêrko Bêkes hestên xwe yên der barê Tevkuştina Helebçeyê de bi vê helbestê tîne zimên.

Bala

*Ba şehîdek û duwan û styan û çuwar
ewsa min her du çawanim
ekirde du coge û robar
Min ewsave
bo malêk û bo gundêk û bo baxçeyêkî
ciwanemerg
em taqedilem ekirde
pelehewrêkî payîze.
Ey êstake bo pênc hezar
çûn bitwanim du çaw bikem
pênc hezar gom û zerya
Du dest bikem
be pênc hezar kolewjî reşhelgeraw
Qurgê bikem be pênc hezar*

gerûy tasaw

*Min ezanim a em jane
wişem ebate gilewe û
hergîz pênc e
lawandinewey çend dirêj be
nagate bala Helebce*

Li ser vê hovîtiya ku bi destê rejîma Saddam çêbûye, bi dehan helbest û gotar hatine nivîsîn, wê hê jî bêne nivîsandin. Me xwest di salvegera 8'an a qetlîamê de bi awayekî cihêreng, wê hovîtiyê bi bîr bînin. Da ku gelê me tu car şehîdên doza xwe û dijminên xwe ji bîr neke. Lewre me çend pirs arasteyî rojnameger Ramazan Öztürk kirin ku wî cihê tevkujiyê bi çavên xwe ditiye û bi wênekêşa xwe dîmenên hovîtiyê ragihandine cihanê. Bi taybetî wêneyê bi navê "Şahidiya bédeng" gelekî deng vedaye.

Ramazan Öztürk bi firokên Îranê bi texmîni di 19 an jî 20'ê adarê de diçe cihê bûyerê. Öztürk dide zanîn ku Îranê ne ji ber ku hez ji kurdan dike, ji ber ku bi Iraqê re şer dike, çapemeniya cihanê biriye cihê qetlîamê. Rojnameger Öztürk dîmena ku ditiye wiha rave dike:

– Hemû kolan tijî cendek bûn. Bêhneke ku mirovan nikaribû xwe li ber ragire, hebû. Ka bifikirin, bêhna bi heza-

ran cendekî, mirov çawa kare xwe ragire. Çermên hin mindalên (zarokên) biçûk şewitî bûn, laşê wan reş bûbû. Cendekê heyf, bi piranî yê zarokên biçûk û mirov kal û pîr bûn. Hinek mindal jî hambêza dayikên xwe de pekiyabûn, li erdê ketûber razabûn. Hin kes li hewşa

mala xwe li ser xwarinê, hin li ber deriyê malê, hin di dema mējandina zarokên xwe de û hin jî di dema listikê de ketibûn destê mirinê. Li derveyî bajêr û zeviyên jî bi sedan cendek hebûn.... Li gorî ku Ramazan Öztürk dibêje, tu giyanewer li bajêr nemane, lê zêde xesar gihîştîye tiştên bêgiyan. Öztürk li ser sedema vê hovîtiyê jî wiha dibêje:

– Di 16 û 17'ê adara 1988'an de Balafirên Hêzên Hewayî ên Iraqê îcar bombeyên gaza jehrî li navçeya kurdan

Helebçeyê dibarandin. Ji ber ku şerê Îran û Iraqê bi hemû tundiya xwe dom dikir û artêşa Iraqê ya ji şer zivêrbûyî, li gelek eniyên şer, lawaz diket.

Öztürk dide zanîn ku li hemberî vê hovîtiyê hemû dinya bédeng maye. Dîsa em ji wî hîn dibin ku wê demê jî Tir-

kiye li dijî gelê kurdên Başûr xebitiye: – Tirkîyeyê daxuyand ku di nav kesên ji herêmê hatine de, ew rastî tu kesên ku bi çekên kîmyewî birîndar bûne, nehatine.

Rojnameger Öztürk ji bo vê, mîna-keke din jî dide. Di sala 1982'an de hêzên kurd û Saddam li hev rûdinin, digihîn encameke baş, lê paşê ji ber tehdîdên Tirkîyeyê Saddam peymanê îmze nake. Li gorî agahiyên ku Talebanî dane Öztürk, rayedarên tirk dane zanîn ku heke Iraq bi kurdan re peymanê îmze bike û hukmê Peymana 1970'yî bipejirîne, wê Tirkîye di şer de piştgiyariya Îranê bike.

Herwiha li gorî gotina Ramazan Öztürk, piştî Şerê Kendavê jî, Amerîkayê

ji ber ku nexwestiye peywendiyên xwe bi Tirkîyeyê re xera bike, ji bo xistina Saddam piştgirî nedaye hêzên dijber ên Iraqê. Lewre welatên wekî Îran, Suriye û Tirkîyeyê nexwestine li Iraqê federasyon bikeve destê kurdan.

Ramazan Öztürk li ser çîroka kişandina "Şahidiya bédeng" jî vê dibêje:

– Di dema kişandina vî wêneyê de, li hemberî vê hovîtiyê ji aliyekî ve hêstir ji çavên min dihatin, li aliyê din jî bêrawestan min du kaset filmî kişandin.

Öztürk diyar dike ku wî; wê demê jî texmîn kiriye ku ev dîmen karibe hovîtiya ku bûye, bi şeweyê herî baş vebêje.

DÜZGÜN DENİZ
SAMİ TAN

